

# Komxebata Zaravên Teknîkî

Teknik Terimler Çalıştayı

Workshop of Technical Terms



KOMXEBATA  
ZARAVÊN  
TEKNÎKÎ

**Komxebata Zaravên Teknîkî**  
**Teknik Terimler Çalıştayı**  
Workshop of Technical Terms

## PÊŞEK

Sal 2012, demsala biharê û meha Gulanê, me nêzî salek xebat kiribû û gava yekem a vê xebatê bi encama Fasîkul-1 xwe gihandibû 15ê Gulanê, cejna zimanê Kurdî û me bi resepsiyonek pîroz kiribû. Piştî Fasîkul-1 em qet nesekinîn û va ev bû salek din jî em xebat dikin, di vê xebatê de jî me gava duyem a xebata xwe bi navê Fasîkul-2 gihand Gulana 2013. Bila ev berhem ji hemû gelê Kurd re pîroz be.

Dîsa bi hevpariya TMMOB(Yekitiya Odeyên Endezyar û Avahîsaz(Telarsaz)ên Tirkiyeyê) û TZP-Kurdî me ev xebat ji bo standardîsazyona zaravên teknîkî doman û bi berhemek nû em bi awayekî dilşa li pêşberî we ne. Xebata par a yekem bû û di vê xebatê de me gelek agahî girtin, em bûn xwediye tecrubeyek mezin. Lewma jî me îsal hinek karê xwe hêsan kir. Weke par ji her çar parçeyên welat û ewropa pisporan venexwend Amedê. Me xebata xwe amade kir û ji wan re şand da ku ew jî fikrên xwe lê zêde bikin.

Berî her tiştî em dibêjin ku keda gelek kesan di vê xebatê de heye lê herî zêde jî lijneya me ya bi navê Lijneya Xebatên Teknikî ên bi Kurdî ya TMMOBê û Lijneya Şêwirmend (ji 10 kesan pêk tê) ku ji gelek pispor û zimanzanan pêk tê. Bi kurtasî me xebat kiriye lê tu car em bi tenê nîn bûn û e, her dem ev lijneya şêwirmend afkariya me kiriye. Hemû serkeftin, başî û rastiyên vê xebatê yê me bi hev re ne. Lê şaşî û çewtiyên vê xebatê tenê yê me ne. Di şaşî û çewtiyan de para Lijneya Şêwirmend tune.

Piştî Gulana 2012yan me lîsteyek peyvan ku ji 3660 peyvan dihat da ber xwe û em li ser xebitîn. Di serî de me Kurdî ya van zaravan nivîsand. Piştî me zaravan yek bi yek ji lijneya şêwirmendiyê re şand. Wan jî fikrê xwe lê zêde kirin û lîsteyê li me vegehandin. Me ew bersivên ku ji lijneya şêwirmend hatine hemûyan da kêleka hev û em ji nû ve li ser van zaravan xebitîn. Di vê xebata ku me li ser 3660 peyvan de cara duyem da dest pê kirin, me fikrên lijneya şêwirmend jî li ber çav girt û zarav zelal kirin. Ji 3660 zaravî 1650 zarav zelal bûn. Piştî re yek bi yek me van peyvan pênase kir da ku her kes wateya wan zanibe. Berî ku em van zaravan bidin çapê me carek ji bo rastnivîsa pênaseyan bi mamosteyê Kurdî-Derê Bahoz Baran û Eşref Keydanî da kontrolkirin. Di dawiyê de jî me van peyvan ji birêz Serwed Denîz re şand da ku ew jî rastnivîsa pênaseyan kontrol bike.

Em hêvî dikin ku emê berî sala 2014 xebata xwe bi FERHENGÂ TEKNIKÎ bi encam bikin. Neha di destê me de ji 5000 zêdetir peyv hene. Vê serdema pêşiya me emê li ser wan jî bixebitin û di dawiyê de emê hemûyan di pirtûkê de bi cî bikin.

**LIJNEYA XEBATÊN TEKNIKÎ ÊN BI KURDÎ**

## LIJNEYA KOMXEBATA FASÎKULA 2.

### 1. **Abdulsamet Ucaman**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Licê ye. Endezyarê Çandiniyê ye. Bi Erebi, Kurmancî û Dimilî zane.

### 2. **Ahmet Durak**

Ji Amedê tevî komxebatê dibe. Ji Şirnexê ye. Xwendekarê beşa endezyariya Maden(Kanza)ê ye.

### 3. **Cihan Taşkıran**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Dêrikê ye. Endezyarê Makîneyê ye.

### 4. **Doğan Hatun**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Pasûrê ye. Xwendekarê beşa Madenê ye.

### 5. **Enis İpek**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Karazê ye. Xwendekarê beşa Madenê ye.

### 6. **Enise Guneyli**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Nisêbinê ye. Endezyara Elektrîk-Elektronîkê ye. Mamosteya Kurmancî ye.

### 7. **Erol BACALAN**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Licê ye. Endezyarê Elektrîk-Elektronîkê ye.

### 8. **Fatma Sümer**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Endezyara Madenê ye.

### 9. **A.Gafûr YILMAZ**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Egilê ye. Avahîsaz(Telarsaz) e.

### 10. **Harun Yalçinkaya**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Çêrmûgê ye. Endezyarê Erdnasiyê ye.

### 11. **Herdem Doğrul**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Avahîsaz(Telarsaz) e.

### 12. **Hesen Guneyli**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Endezyarê Elektrîk-Elektronîkê ye. Pirtûka Matematîkê nivîsiyê. Mamosteyê Kurmancî ye. Edîtoriya malpera endezyariyê bi Kurdî (endezyar.org) dike.

### 13. **Kadir Yılmaz**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Endezyarê Makîneyê ye.

### 14. **Kadri Dolu**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Erxenyê ye. Endezyarê Nexşe û Kadas-troyê ye.

**15. M. Emin Tûmür**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Amedê ye. Endezyarê Makîneyê ye. Ma-mosteyê Kurmancî ye.

**16. Mehmet ORAK**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Endezyarê Elektrîk-Elektronîkê ye.

**17. Nedîm Tûzûn**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Hezoya Êlihê ye. Endezyarê Elektrîk-Elektronîkê ye.

**18. Nîhat Noyan**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Farqînê ye. Endezyarê Avahiyê ye.

**19. Selaheddîn Elçî**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Dihê ye. Endezyarê Nexşe û Kadastroyê ye.

**20. Serhat Bîçen**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Erxaniyê ye. Ji Bedlîsê ye. Endezyarê Makîneyê ye.

**21. Suat Yavuz**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Cîrnêreşê ye. Endezyarê Makîneyê ye. Ma-mosteyê Kurmancî ye.

**22. Şerefxan Aydın**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Licê ye. Avahîsaz(Telarsaz) e.

**23. Yaser Fîrat**

Ji Amedê tevî komxebatê dibe. Ji Tekmana Erziromê ye. Xwendekarê beşa endez-yariya Maden(Kanza)ê ye.

**24. Yıldız TAHTACI**

Ji bajarê Amedê tevî komxebatê bû. Ji Cîhanbeyliya Konyayê ye. Plansazê Bajar e.

## LIJNEYA ŞÊWIRMENDIYÊ

**1. Denîz Gunduz**

Ji koma Vate ye û bi salan e xebatên Dimilî dimeşîne.

**2. Dilêr Hesên**

Li bajarê Duhokê dijî. Ji Duhokê tevî xebata me bû. Avahîsaz(Telarsaz) e.

**3. Ebdulsettar Asim**

Li bajarê Hewlêrê dijî. Ji Hewlêrê tevî xebata me bû. Teknîkerê Elektronîkê ye.

**4. Edalet Milan**

Li bajarê Qezwîn a Îranê dijî. Endezyarê Kîmyayê ye.

**5. Mohammed Milan**

Li bajarê Qezwîn a Îranê dijî. Endezyarê Makîneyê ye.

**6. Ramazan Hemze**

Li bajarê Duhokê dijî. Ji Duhokê tevî xebata me bû. Endezyarê Erdnasiyê ye.

**7. Sebrî Hesên Sebrî**

Li bajarê Duhokê dijî. Ji Duhokê tevî xebata me bû. Mamosteyê Fizîkê ye.

**8. Serwed Deniz**

Li bajarê Amedê dijî. Edîtor û Mamosteyê Kurmancî ye.

**9. Zagros Haco**

Ji Ewropayê dijî. Ji Kurdên rojava ye. Endezyarê Telekomunîkasyonê ye.

**10. Zana Farqînî**

Li bajarê Stembolê dijî. Endamê Enstîtuya Kurdî ya Stembolê ye. Nivîskarê ferhengeke mezin ya Kurdî-Tirkî ye.

## SPASÎ

Ji bo piştgirî û alîkariya wan em spasiyên xwe ji lijneya şêwirmendi-yê re dikin. Van hevalan bi sebreke mezin, kedekê mezin û hevaltiyeke mezin her dem bi me re bûne.



Ji bo alîkariya wan em spasiyên xwe ji birêz Serwed Denîz, birêz Bahoz Baran û birêz Eşref Keydanî re pêşkêş dikin.

Ji bo piştgirî û alîkariya wan em spasiyên xwe ji serokên odeyên endezyar û avahîsaz(Telarsaz) ên Amedê; Serokê Odeya Avahîsazan birêz Necatî Pirinççioğlu, Serokê Odeya Endezyarên Çandiniyê birêz Şîhat Şengal, Serokê Odeya Endezyarên Elektrîkê birêz İdris Ekmen, Serokê Odeya Endezyarên Avahiyê birêz Turan Kapan, Serokê Odeya Endezyarên Madenê birêz Mustafa Doğu, Serokê Odeya Endezyarên Makîneyê birêz Mesut Çelik, Serokê Odeya Endezyarên Erdnasîyê birêz Harun Yalçinkaya, Serokê Odeya Endezyarên Nexşe û Kadastroyê birêz Hüseyin Kırşan re pêşkêş dikin. Wan herdem bi awayekî berpirsyar û hêvîdar piştewaniya me kirine.

Gelek caran me civînên xwe li eywanên civînê yên odeyên şaxê Amedê dikir û di rojên civînan de xebatkarên odeyan bi me re gelek eleqedar dibûn û gelek xizmeta me dikirin. Bi taybetî Xebatkarê Odeya Endezyarên Avahiyê, Xebatkarê Odeya Avahîsazan, Xebatkarê Odeya Endezyarên Elektrîkê, Xebatkarê Odeya Endezyarên Makîneyê, Xebatkarê Odeya Endezyarên Nexşe û Kadastroyê û ji hemû xebatkarên odeyan re spasiyên xwe pêşkêş dikin.



# A

Kurdi	Tirkî	Îngilîzî	Beş	Pênase
<b>Acûr :: Xişt</b>	Tuğla	Brick	Avahîsazî	Kereseyekî ku di lêkirina avahiyên de tê bikaranîn. Axa sor a gil di nav qalibên taybet de tê bicihkirin û piştî ku ziwa dibe di hetûnê de tê sorkirin. 
<b>Adan :: Kêrhatî :: Çust :: Kargîn</b>	Verim	Efficient	Makîne	Randiman
<b>Adapte :: Guncandin</b>	Adepte :: Uyarlama	Adopt :: Adapt	Çandinî	Hînbûna şert û mercên jiyaneke din.
<b>Agir</b>	Ateş	Fire	Elektrîk	Agir oksîdasyona barîstê ye di prosesê kimyayî de, ya ku pir bi lez diqewime. Encama şewatê wîzeya germî û ronahiyê ye.
<b>Agirgir</b>	Yanîcî	Flammable	Makîne	Madeyên şewatok. Madeyên ku agir bi hêsanî pê dikeve. Mînak; Rejû (Komir), Êzing, Berhemên Petrolê.
<b>Agirmak :: Sojer</b>	Yakîcî	Burning :: Caustic	Makîne	Madeya ku taybetiya wî şewitandin e. Dibe bi germahiya xwe bişewitîne, dibe ku bi taybetiya xwe ya kimyayî jî bişewitîne.
<b>Ajal :: Ajel</b>	Hayvan	Animal	Çandinî	Ji bilî mirov û nebatan hemû zindiyên din. Mînak; Çêlek, Masî, Teyr, Kêzik, Kurmik . . .
<b>Akû :: Komker</b>	Akû :: Akümülatör	Accumulator	Elektrîk	Amûra ku enerjîya elektrîkî bi awayê enerjîya kimyayî di nava xwe de kom dike, dema pêwîst be enerjîya kimyayî bi awayê enerjîya elektrîkî dide derve.
<b>Alav</b>	Lav	Lava	Elektrîk	Agirê ku ji kêrahiya binê erdê bi pişqîna ji çiyayê agirîn derdikeve ser rûyê erdê.
<b>Alav :: Amraz</b>	Alet	Tool	Makîne	Parçeyên ku makîneyekê pêk tînin û wê dixebitînin. Heyberên ku kar bi wan tê kirin. 
<b>Alfa :: Elfa</b>	Alfa	Alpha	Elektrîk	Tîpa pêşîn a alfabeya yewnanî ye
<b>Algorîtm</b>	Algoritma	Algorithm	Elektrîk	Di Serdema Navîn de ji bo hesabên jimarên dehi hatiye bikaranîn



Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Alkol</b>	<b>Alkol</b>	Alcohol	Elektrik	Şilemeniya ku ji tiştên wek kartol, silk an jî şerab û birayê tê derxistin, fûrek û bibêhn e.
<b>Alozi</b>	<b>Karışıklık</b>	Confusion	Makine	1. Tevlihev 2. Teqoze.
<b>Alterasyon :: Guherîn</b>	<b>Alterasyon :: Bozulma</b>	Alteration	Maden	Guherîna kanzayan (maden) a bi bandora fizîkî û kimyayî.
<b>Amadekirin</b>	<b>Hazırlama</b>	Preparation	Maden	Xebatên beriya destpêka hilberîna gewheran.
<b>Amêje :: Darişte</b>	<b>Alaşım</b>	Alloy	Kîmya	Herî kêm ji du metalan çêdibe. Du yan jî zêdetir metal di nava hev de dikelijin û piştê madeyeke cuda li gora taybetmendiyên fizîkî çêdibe. Mînak; Tûnc, Qela.
<b>Amper</b>	<b>Amper</b>	Ampere	Elektrik	Nîşana wê A ye. Amper yekeya SI (Sistême international d'unités) bo rewta elektrîkê ye. Li gor pênaseyê: 1 amper ew rewte e, ya ko dema di nav di du bîstên rast û paralel re, yê bê dawî dirêj in û metreyekê ji hev dûr in, derbas dibe, ew hêzêke bi qasî 2·10 <sup>-7</sup> newton li ser metrê (N/m) di nav her du bîstan de diafirîne.
<b>Amper-pêç</b>	<b>Amper sarım (akım mıknatıslık birimi)</b>	Ampere- turn	Elektrik	Yeksaniya bandora 1 amperê ya di 1 pêçê de derbas dibe.
<b>Amperpîv :: Empêrpêw :: Ampermetir</b>	<b>Ampermetre</b>	Ammeter :: Ampermeter	Elektrik	Amûra ku amperê dipîve.
<b>An :: Yan</b>	<b>Yada</b>	Or	Elektrik	Di mantiqê de deriyê ku ji tîketinê yek jî erê be yan jî hebe, encam erê ye.
<b>Analîtîkî :: Şikarî</b>	<b>Çözümsel :: Analitik</b>	Analytical	Avahî	Zanîstiya dahûrandinê.
<b>Anod</b>	<b>Artı uç :: Anot</b>	Anode	Elektrik	Di elektrîkê de cemsêra pozîtîf. Elektroda pozîtîf.
<b>Ardû :: Sotemenî</b>	<b>Yakacak</b>	Firewood	Avahî	Ew tiştê ku ji şewitandina wî sûd tê girtin.
<b>Arik :: Asreq :: Sepitk :: Serke :: Miç :: Qatî</b>	<b>Tavan</b>	Ceiling	Avahîsazî	Asta herî bilind a avahiyeke ku ser wê girtî be.
<b>Arize :: Girift</b>	<b>Arıza</b>	Defect	Maden	Pirsgirêkên mekanîk. Xerabûna amûrên mekanîk
<b>Asid</b>	<b>Asit</b>	Acid	Elektrik	Madeyê şilek ku rengê kaxizê tûrnûsolê ji kesk dizivirîne sor. Madeyê ku pH'a wî ji 7,5 biçûktir e.
<b>Aspîrator :: Bakêş :: Hewakêş</b>	<b>Aspiratör</b>	Aspirator	Makine	Amûr an jî makîneya ku hewayê davêje derve. Bi alîkariya perwaneya xwe ya ku dizivire bayê dikêşe (dimije) û davêje derve.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Asteng :: Berbest</b>	Engel	Barrier	Avahî	Ji bo ku rê li ber qezayan bê girtin li qeraxê rê ji hesin wek caxan tê çêkirin, ji bo trafika nava bajêr bi awayekî hêsan biherike ji betonê tê çêkirin û danîn.
<b>Astenga Coulomb :: Berbeste Coulomb</b>	Coulomb engeli	Coulomb barrier	Elektrîk	Bendava enerjîyê ya li pêşya du dendikan ku ji bo du dendik (nuclei) bigihîjin hev (fusion). Ji aliyê enerjîya potansiyel a elektrostatîk ve tê çêkirin.
<b>Asûna dawî :: Cîgeha dawî :: Duwacih</b>	Nihai pozisyon	End position	Maden	Merhela berhemên kanzayî ya piştî kirariya dawîn.
<b>Asûna nêtar :: Asûna bêlayan</b>	Nötr konum	Neutral position	Maden	Asûna (pozisyon, rewş) bidawibûna bandora meqletizê.
<b>Aş</b>	Değirmen	Mill	Avahî	Avahiya ku genim lê tê hêrandin û dibe arvan, mînak, Aşê avê, aşê agir (aşê elektrîkê)
<b>Aşê kevîran :: Berhêr</b>	Çakıl değirmeni	Pebble mill	Maden	Aşê ku kevîran hûr dike.
<b>Aşîr :: Şape</b>	Çığ	Avalanche	Elektrîk	Ji bo koma berfê ya ku ji çiyê ber bi jêr ve digindire.
<b>Aşkera :: Diyar :: Kifş</b>	Görünen	Apparent	Elektrîk	Tiştê ku xuya dike yan jî li ber çavan e.
<b>Atmosfer</b>	Atmosfer	Atmosphere	Elektrîk	Gaza li dora dinyayê.
<b>Atom</b>	Atom	Atom	Elektrîk	Li goşî filozofên yewnanî, hêmanen bingehîn ên rastiyê yên ku parçe nabin û xera nabin.
<b>Atomên wergir :: Gerdîleya wergir</b>	Alıcı atomlar	Acceptor atoms	Elektrîk	Atomên ku hejmara elektronên wan ji hejmara protonên wan kêmtr in. Atom her dem hewl didin ku hejmara proton û hejmara elektronên wan yeksan bin.
<b>Av</b>	Su	Water	Elektrîk	Madeya şilek a bê reng, bê bêhn, bê tam e. Ji du hidrojen û oksijenekê pêk tê. Formûla wê H <sub>2</sub> O ye.
<b>Ava bir(Sib)ê</b>	Kuyu Suyu	Well Water	Erdnasî	Ava ku bi bîrkolê (sondaj) ji bin zemînê tê derxistin.
<b>Ava çaviyê</b>	Gözenek suyu	Pore water	Erdnasî	Ava ku ji qulqulikên erd an jî ciyan de dertê.
<b>Ava jêrerd :: Ava jêrzemîn</b>	Yeraltı suyu	Groundwater	Erdnasî	Ava berf û baranê ya ku bi riya qelîstekên zemînê di bin erdê de digihîje hev û kom dibe.
<b>Ava jêrzemîn :: Ava binerd</b>	Serbest yer altı suyu	Free phreatic water	Maden	Ava li bin erdê sekan e. Dema ku kanza tê kolan ev av di nav qelş û derzan de dizê yan diherike.
<b>Ava kaniyê :: Kaniav</b>	Kaynak suyu	Spring water	Erdnasî	Ava jêrerdê ya ku bi awayekî xwezayî derdikeve rûyê erdê.
<b>Avahî</b>	İnşaat	Building	Avahî	Ew avahiya ku ji bo çêkirina wê xebat bê kirin.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Avahî</b>	Yapı	Building	Avahî	Hemû berhemên avahîsazî û endezyariyê yên mîna xanî, pir û hwd. ên ku ji aliyê mirovan tîn çêkirin. Bi mebesta hêwirandin û hêsankirina jiyane ye.
<b>Avahîkar</b>	İnşaatçı	Builder	Avahî	Kesê/a ku di lêkirina avahiyên de cih digire.
<b>Avahîkarî</b>	İnşaatçılık	Building	Avahî	Xebata çêkirina avahiyên.
<b>Avahîsazî :: Telarsazî</b>	Mimarlık	Architecture	Avahîsazî	Pîşeya avahîsazan.
<b>Avahiyên dîrokî</b>	Tarihi yapı	Historical structure	Pilansazên Bajêr	Avahiyên kevnare ku xwedî nirx û taybetmendiyên baş in.
<b>Avakirin</b>	İnşa etmek	Build	Avahîsazî	Lêkirina avahiyên.
<b>Avakirin</b>	Kurmak	Build up	Avahî	Sazkirina parçeyên avahiyê.
<b>Avdan</b>	Sulama	Irrigation	Çandinî	Di erdê bejî de ji karê avdaniya rehekan re te gotin.
<b>Avdank</b>	Suluk ( su kabı )	Water Bowl (water container)	Çandinî	Amûreke ji bo ajal pêdiviyên xwe yê avê bi cih binin.
<b>Avêtina kevaneyî :: Avêtina xwar :: Avêtina lar</b>	Eğik atış	Oblique shot	Elektrîk	Hevedudaniya tevgera stûnî û tevgera araste ya rast e. Tevgera kevîrê ku dema mirov ber bi pêş ve diavêje ye.
<b>Avgerm</b>	Sıcak kaynak suyu :: Kaplıca	Hot spring	Erdnasî	Ava germ a ku bi rêya qelîştêkê di zemîn de ji kûrahiya binzeminê der tê.
<b>Avî</b>	Su içeren	Water-carrying	Maden	Tiştê ku bi avê re eleqedar e.
<b>Avî</b>	Sulu	Aqueous (aq)	Çandinî	Yê ku ji avê pêk hatiye, avdar.
<b>Avkêşî :: Avtêbihurî :: Dellandin</b>	Su geçirgenliği	Water permeability	Erdnasî	Pîleya avtêbihurîna (avkêşîya) hişkiyên serzemin û binzeminê
<b>Avnasî</b>	Su bilimi :: Hidroloji	Hydrology	Elektrîk	Zanista ku li ser avê xebatê dimeşîne.
<b>Avnekêş :: Avgîr :: Avnemij :: Avragir :: Avtênebihur</b>	Su geçirmez	watertight	Çandinî	Cih an jî tiştên ku avê de derbas nabe.
<b>Avrêjk</b>	Pisuvur	Urinal	Avahî	Ew alava ku mirov li piyan destava xwe ya biçûk tê de dike.
<b>Ax</b>	Toprak	Soil	Çandinî	Ji rizîna kevîr û madeyên organîk çêdibe û di nava xwe de gelek ajal, nebat (rîwek) û organizmayên zindî dihewîne. Dar û rîwekên din bi axê disekin û jê avê û pêwîstiyên xwe yê jiyani digirin. Ruyê cîhanê wek tebeqeyekê pêçaye.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Axa gelêşî :: Axa rizî</b>	<b>Humuslu toprak</b>	Humic soil	Çandînî	Axa ji rehek (nebat) û zindiyên riziyayî çêbûye. Rengê wê reş e, avê baş dihwine û ji aliyê mîneralan ve zengîn e.
<b>Axa sor :: Gila sor</b>	<b>Kırmızı kil</b>	Laterite	Erdnasî	Axa ku di pêkhateya xwe de yan ji di nava xwe de Alumînyum siliqat ( $Al_2O_3 \cdot 2SiO_2 \cdot 2H_2O$ ), hesin oqşit ( $Fe_2O_3$ ), magnezyûm (Mg), kevirê kilsê ( $CaCO_3$ ), dihwine. Axeke zixur, biçûk, şidiyayî û avtênebihûr e.
<b>Axban</b>	<b>Toprak dam</b>	Soil roof	Avahî	Banên xaniyan ên ku bi axê hatine çêkirin.
<b>Axur</b>	<b>Ahır</b>	Stable	Çandînî	Avahiya ku ji bo hêwirandina ajalên hatiyê çêkirin.
<b>Aydingir</b>	<b>Aydingir</b>	Tracing	Avahî	Kaxiza şimakiñ ye, ji bo çêkirina projeyan tê bikaranîn.

## B

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Babelîsk :: Bablîsok :: Gerdelûl</b>	<b>Hortum</b>	Whirlwind	Makîne	Bûyera ku ba (hewa) li dora xwe dizivire û wek stûnekî bi jor ve hildikişe.
<b>Bac</b>	<b>Vergi</b>	Tax	Nexşe	Ew pereyê ku dewlet ji hemwelatîyên xwe ji bo xizmetên gelemperî bike, digre.
<b>Baca Maldariyê :: Baca xanûberan</b>	<b>Emlak vergisi</b>	Land tax :: Property tax	Nexşe	Pereyê ku xwediyê milk dide dewletê.
<b>Bacdarkirin</b>	<b>Vergilendirme</b>	Taxation	Maden	Lê ferzkirina bacê ya li ser kesekî yan jî sazîyekê.
<b>Bafon :: Fafon</b>	<b>Alüminyum</b>	Aluminium	Elektrîk	Elementeke ku numreya wê ya atomê 13, giraniya wê ya atomî 26,98 û di 660 c'yî de dihele; kurteya wê "al" e
<b>Bager</b>	<b>Kasırğa</b>	Hurricane	Makîne	Bayê herî bi hêz û tund, bayê barhilgir û fetlonekî.
<b>Bahoz :: Gerdelûl</b>	<b>Fırtına</b>	Storm	Erdnasî	Bayê bilez, bayê ku toz û talazê radike.
<b>Bajar :: Şar</b>	<b>Şehir :: Kent</b>	City	Avahîsazî	Warê ku mirov lê dijîn û bi piranî karê bazirganiyê yan jî karê pişesaziyê dikin.
<b>Bakterî</b>	<b>Bakteri</b>	Bacteria	Çandînî	Mikroorganizmaya yekşane.
<b>Balafir :: Firoke</b>	<b>Uçak</b>	Airplane	Elektrîk	Barbireke (seyare) ku bilind dibe û difire.
<b>Balafirgeh :: Firokexane</b>	<b>Havalimanı :: Hava alanı</b>	Airport	Avahîsazî	Çhên taybet ên ji bo balafir lê deynin û rabin.
<b>Balîsk :: Akasya zer</b>	<b>Sarsalkım :: Sarı akasya ağacı</b>	Laburnum vulgare griseb	Çandînî	Famîlyeyê darên pelfirê e. Kulîlkên xwe biharê vedike.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Ban</b>	<b>Çatı</b>	Roof :: Rack	Elektrîk	Tebeqeya ku ser xanî digire.
<b>Ban</b>	<b>Dam</b>	Roof	Avahî	Serê xanî, diyarê xanî
<b>Band</b>	<b>Band</b>	Band	Elektrîk	Di spektrûma elektromagnetîk de beşeke ku di navbera frekansên diyar dihevine. Mînak; Banda P (navbera 200 MHz û 400 MHz)
<b>Banda îzolasyonê :: Têp :: Banda şiyareker</b>	<b>Yalıtıcı bant</b>	Insulation tape	Maden	Cureyêki bandê ya ku ji bo parastina ji germahî, serma, elektrîkî, av an jî hwd. tê bikaranîn.
<b>Bangeran :: Bangor :: Xiloke</b>	<b>Loğ</b>	Roller	Avahî	Ji bo ku axa sist bê şidandin tê bikaranîn, gilover û dirêj e û her du serên wî jî çehl in.
<b>Baqil</b>	<b>Baklagil</b>	Legume	Çandînî	Giyayên ku tovê wan di nav baqilan de ne.
<b>Bar</b>	<b>Yük</b>	Load	Kompîter	1. Mêjera elektrîkê ya ku li rûxara heyberekê kom dibe. 2. Giraniya tiştêki.
<b>Barbike :: Barke</b>	<b>Yükle</b>	Load	Elektrîk	1. Çih guhertina daneyan ji amûrekê ber bi amûreke din (wêneyên di CD'yê de derbasî kompîtuê bike). 2. Lê siwarkirina heyberekê li barbirê.
<b>Barê erdhêjê :: Barê bûmelerzê</b>	<b>Deprem yükü</b>	Earthquake load	Erdnasî	Pîleya bandora bûmelerzê ya li ser avahiyan.
<b>Bariste</b>	<b>Kütle</b>	Mass	Elektrîk	Mêjera madeyê ya heyberan.
<b>Barkirin</b>	<b>Şarj etmek</b>	Charging	Elektrîk	Lê barkirina enerjîya elektrîkê. Mînak; barkirina li akûyê.
<b>Barkirin</b>	<b>Yükleme :: Doldurma</b>	Load	Elektrîk	Lê barkirina enerjîyan ji baristeyê.
<b>Barometre :: Barometir</b>	<b>Barometre</b>	Barometer	Elektrîk	Amûra ku pestoya bayê (hewayê) dipîve.
<b>Barometre :: Barometir :: Pestanpîv</b>	<b>Basınçölçer :: Barometre</b>	Barometer	Elektrîk	Amûra ku pestoya hewayê (ba) dipîve.
<b>Barûd</b>	<b>Barut</b>	Gunpowder	Elektrîk	Madeya ku di guleyan de ji bo teqînê tê bikaranîn.
<b>Baryon</b>	<b>Baryon</b>	Baryon	Elektrîk	Baryon ji atomê girantir û biçûktir e.
<b>Baskê bergir</b>	<b>Direnç kolu</b>	Resistance arm	Fizîk	Di mekanîzmaya qerase (malêle) de navbera xala bar û xala destekê ye.
<b>Baskê hêzê</b>	<b>Kuvvet kolu</b>	Force arm	Fizîk	Di mekanîzmaya qerase (malêle) de navbera xala hêzê û xala destekê ye.
<b>Bastêq</b>	<b>Pestil</b>	Membranedried fruit pulp	Çandînî	Şîrnahiyeke ku ji şîreya tirî çêdibe. Pîlora ku ji şîreyê çêdibe li ser rûyekî tê raxistin da ku hişk dibe û dibe bastêq.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Baştirîn</b>	Optimum	Optimum	Makîne	Yê herî qenc. Çêtirîn.
<b>Başûr</b>	Güney	South	Avahî	Milê mirov ê çepê li rojhilat û milê mirov ê rastê li rojava binêre, ew aliye ku berê mirov lê ye başûr e.
<b>Bauhaus</b>	Bauhaus	Bauhaus	Avahîsazî	Zanîngeheke li Almanyayê. Dema ev zanîngeh tê avakirin avahîsaz û hunermendên navdar lê dest bi xebatê dikin. Û nêrîna vê zanîngehê di warê avahîsazî û sêwirandinê de dibe wek ramanekê nû.
<b>Bax :: Baxçe :: Rez</b>	<b>Bağ :: Bahçe :: Meyve bahçesi</b>	Orchard	Çandinî	Erdê ku tê de çandina tirî, fêkî, zerezawat û hwd. tê kirin.
<b>Baxçe</b>	<b>Bahçe</b>	Garden	Çandinî	Erdê ku tê de çandina tirî, fêkî, zerezawat û hwd. tê kirin.
<b>Bayt</b>	Bayt	Byte	Elektrîk	Baytek 8 bit e, pîvana wateya birê ye.
<b>Bazdan :: Baz dan</b>	Koşmak	Run	Fizîk	Bi gavên lezgin bi peş ve çuyîn.
<b>Bêber</b>	Verimsiz	Unproductive	Maden	1. Sûdgirtina kêma ku li gora jê tê hêvikirin ber jê nayê girtin. 2. Kana ku rêjeya gewhera wê kêma e.
<b>Bêder :: Bênder</b>	Harman yeri	Threshing field	Çandinî	Çiyê ku genim, nîsk û nokan kom dikin û ji hev diqetînin.
<b>Bêgazkirin</b>	Gazsızlaştırma	Degassing	Maden	Jê derxistina gaza ku ji bo jiyana xebatkarên kanê xetere ye. Mînak; Bi alikariya bakêşê derxistina gaza metanê.
<b>Behiv</b>	Badem	Almond	Çandinî	Fêkiyê ku qalîkê wê hişk û di nava qalîkê wê de kakîlek yekpare heye. Berî ku baş bigihîje navê wê behivter (geroh, gulh) e. Tehma hinek behivan tehl e.
<b>Bêhn</b>	Koku	Odor	Elektrîk	Pîrîskên (ên ku bandorê li ser pozê mirov dikin) biçûçîk ku ji tiştan belav dibin.
<b>Bêhn</b>	Koku	Smell	Elektrîk	Bandora pîrîskên biçûçîk ku ji tiştan belav dibin û türeyên (sînîr) pozê (bêvil, difin) mirov hişyar dike. Bêhna gulê, bêhna sosinê, bêhna sulfurê. . .
<b>Bejî</b>	<b>Kuru :: Kıraç :: Yağış almayan</b>	Moor	Çandinî	Erdê bêav.
<b>Beledî</b>	Şimşek	Lightning flash	Elektrîk	Ronahiya birûskê ye. Ronahiya ku bi valabûna barê elektrîkê di nava ewr û erdê yan ewr û ewrekê de dertê holê û wek xêzeke şikestî çik dide.
<b>Belexwarî :: Xwaromaro</b>	Eğri büğrü	Crooked	Elektrîk	Tişt, xêz an jî rêya ku cî bi cî xwar e. (ne rast)
<b>Belot:: Berû :: Belû</b>	Meşe palamudu	Acorn	Çandinî	Fêkiya dara mazî an jî fêkiya dara berû.
<b>Bênav</b>	Adsız :: İsimsiz	Anonymous	Elektrîk	Kes an jî tiştê ku nav lê nehatiye kirin.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Bendava axî :: Axebendaw</b>	Toprak baraj	Earth dam	Erdnasî	Bendava ku bi axa avtênebihûrî hatiye avakirin.
<b>Bendava betonî :: Konkirîte bendav</b>	Beton baraj	Concrete dam	Erdnasî	Bendava ku li ser zemîneke bi teht ji betonê hatiye avakirin.
<b>Bendava bi axê dagirtî</b>	Dolgu baraj	Earth Fill dam	Erdnasî	Bendava ku bi kevirên gewre û bi axa avtênebihûrî hatiye avakirin.
<b>Bendava bi kevîran dagirtî :: Bendava Berdrêj</b>	Kaya dolgu baraj	Rock fill dam	Erdnasî	Bendava ku bi kevirên gewre û bi betonê hatiye avakirin.
<b>Bendava bipayenda :: Bendava bipalpişt</b>	Payandali baraj	Buttress dam	Erdnasî	Bendava ku hîmê wê yan jî sîsîka (dendik) wê bi palpiştiyekê hatiye piştgirîkirin.
<b>Bender :: Bendergeh :: Lengergeh</b>	Liman	Harbour :: Harbor	Avahîsazî	Cihê ku keşti lê radiwestin. Rawestgeha keştiyan.
<b>Bengele</b>	Makas	Truss	Avahîsazî	Kêranên ku ji hesin tên çêkirin, ji bo hilgirtina banên hin avahiyên fireh (palûke, otogar). Dema firehî ji 30 m'î dibihure ev kêran tên bikaranîn. Ji cureyên profilên hesinî (an jî pola) tên çêkirin. Di banê avahiyên fireh ku kolonên wan hindik in mîna eywanên dawetê, avahiyên palûkeyan, pirên hesinî, xerac (otogar), avahiyên pişesaziyê û hwd. de tên bikaranîn.
<b>Benzîn</b>	Benzin	Gasoline	Elektrîk	Ji petrolê çêdibe, teqla wê 0,65, bê reng û fûrek e.
<b>Benzînxane :: Gazxane</b>	Benzin İstasyonu	Gas station	Avahîsazî	Cihê firotina benzîn û gazê.
<b>Bêr</b>	Kürek	Shovel	Çandinî	Amûreke karkeran.
<b>Ber :: Panî</b>	En	Width	Avahî	Firehî
<b>Berahiya pêlê :: Firehiya pêlê ::</b>	Dalga genliği	Amplitude of wave	Elektrîk	Navbera bilindtirîn xala pêlê û sifirê (eksen). Bilindahiya pêlê.
<b>Beran</b>	Koç	Ram	Çandinî	Mêşîna (Mî) nêr.
<b>Beravêtin :: Ber avêtin</b>	Yavru atmak :: Düşük yapmak	Miscarry	Çandinî	Ji bo ajalan bûyîna têjîkên mirî. Heke ajalek berî ku bizê têjîka wê di zikê wê de bimire ji wê ajalê re dibêjin "beravêti ye".
<b>Berbank</b>	Teras	Terrace	Avahî	Qada (beş) derve ya ku tê bikaranîn a avahiyekê ku ji erdê bilindtir e. Bi gelemperî di avahiyên de li tebeqeya bilindtirîn tê çêkirin.



<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Berdbir</b>	<b>Taşç</b>	Stonecutter	Avahî	Kesê kevir dişikêne; kesê kevir dibire. Kevirbirên ku ji bo xanî û avahiyên keviran çêdikin.
<b>Berdewamî</b>	<b>Sürekli</b>	Continuity	Maden	Tiştê domdar.
<b>Berê</b>	<b>Önce</b>	Before	Fizik	Wexta ku derbas bûye.
<b>Bêreng</b>	<b>Renksiz</b>	Achromic	Elektrik	Tiştê ku rengê wî tune ye.
<b>Berfîn</b>	<b>Kardelen</b>	Snowdrop	Çandinî	Cureyekî kulîlkan e. Li çiya û zozanan bi destpêka biharê re ku berf dihele hêşin dibe. Di bin berfê de hêşin dibe, dema roj lê dide hişk dibe.
<b>Bergegirî</b>	<b>Sürekli mukavamet</b>	Durability	Avahî	Rewşa xwegirtina li hemberî teka (karigerî) kimyayî, fizikî û mekanîkî. Xwegirtina li dijî guhertinan.
<b>Bergir</b>	<b>Direnç</b>	Resistance	Elektrik	Yekeya wê ohm e. Amûreke kêmgihîner e. Li gora hêza xwe tezûya (herk) elektrîkê kêmbike.
<b>Bergira guherbar</b>	<b>Ayarlı direnç :: Reosta</b>	Variable Resistance	Elektrik	Bergira ku guherîna wê pêkan e.
<b>Bergirên hevrek :: Bergirên hawrek :: Bergirên terîbî</b>	<b>Paralel dirençler</b>	Resistors in parallel :: Parallel resistors	Elektrik	Di vedorê (circuit) de bergirên li kêleka hev in. Seriyê bergirê bi seriyê bergira din ve, dawiya bergirê jî bi dawiya bergira din ve tê girêdan.
<b>Bergirî</b>	<b>Mukavamet</b>	Endurance	Avahî	Tirûşa (rezîstans) ku li hemberî hêzên derve ji bo parastina taybetmendî û şeweyê xwe tê nîşandan. Di heman erdhejê de bergirîya avahiyên ku hilnawêşin ji bergirîya avahiyên ku hildiwêşin zêdetir e.
<b>Bergirîya erdhêjê :: Bergirîya bûmelerzê</b>	<b>Deprem dayanımı</b>	Earthquake resistance	Erdnasî	Pileya barhilgirîya avahiyê ya li hemberî bûmelerzê.
<b>Berhema paşîn :: Diwaberhem</b>	<b>Nihai ürün</b>	Finished product	Maden	Gewhera ku lê tê gerîn û di dawiya veqetandinê de bi dest dikeve.
<b>Berhevkar :: Komker</b>	<b>Derleyici</b>	Compiler	Komputer	Ew ê ku hilbijartinê dike û dide hev.
<b>Berhilanîn :: Berûbûm</b>	<b>Ürün</b>	Harvest	Çandinî	Hilberînên zevî, bax û baxçeyan.
<b>Berjêr :: Nişov</b>	<b>Yokuş aşağı</b>	Downhill	Avahî	Rêya ku mirov lê diçe û berê mirov li aliyê rê yê jêrîn be, ya jî serejêr be.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Berkaş :: Rempa :: Riyêlêj</b>	Rampa	Ramp	Avahîsazî	Hevraz. Qiyame. Riya hevraz. Riya ku di domahiya xwe de bilind dibe.
<b>Bêrm</b>	Suyun toplandîgi yer	Watering hole	Çandinî	Gola ku av tê de dicive.
<b>Bermal</b>	Taban :: Kat	Floor	Avahîsazî	Di hundir de zemîn, asta herî nizm a cihêki ser girtî.
<b>Bermayî :: Jêmayî</b>	Artik	Residual :: Gob	Maden	Madeyên di veqetandina gewherê de bi kêr nayên û têne avêtin.
<b>Bersivdan</b>	Yanîtlamak	Answer (to)	Elektrîk	Li hemberî pîrsekê axaftina der barê wê pîrsê de.
<b>Bertek :: Kartiyaker :: Reaktans</b>	Tepki	Reactance	Elektrîk	Bersivdana ji bo bûyereke fizîkî, reaktans.
<b>Berx</b>	Kuzu	Sheep	Çandinî	Têjika (çêlik, ferxik) mêşinê (mih).
<b>Berxwedêrî</b>	Dayanım	Strength :: Resistance	Makîne	Taybetiya berteka li hemberî hêza derve. Xweparastina li hemberî rewşê.
<b>Beş :: Pişk</b>	Bölme	Partition	Elektrîk	Parçekirin û ji hev qetandina heyberekê.
<b>Beta</b>	Beta	Beta	Elektrîk	Tîpa duyemîn a alfabeya Grekî ye.
<b>Betatron</b>	Betatron :: Elektron hızlandırıcısı	Betatron	Elektrîk	Amûra ku elektronan dilezîne.
<b>Betirpêrar</b>	Üç yıl önce	Three years ago	Fizik	(Sê) 3 sal berê.
<b>Beton</b>	Beton	Concrete	Avahî	Bi tevdana çimento, xîz, xîçik û avê çêdibe. Piştî çend demjimêran hişk dibe. Li gora bergirîya betonê rêjeya van madayan diguhere.
<b>Betona amade</b>	Hazır beton	Ready-mixed concrete	Avahîsazî	Betona li santralê tê amedekirin û di lêkirina avahiyan de tê bikaranîn.
<b>Betona şîşbendkirî :: Betonarme</b>	Betonarme	Reinforced concrete	Avahî	Betona ku bi şîşên pola tê zeximkirin da ku li hemberî erdhej û giraniya xwe neşikê. Betonarme di hemû avahiyan de tê bikaranîn.
<b>Bexdenûs</b>	Maydanoz	Parsley	Çandinî	Giyayekî wek biharatê tê bikaranîn.
<b>Beyar</b>	İşlenmemiş toprak: Sürülmeyen yer	The raw land	Çandinî	Axa ku lê çandinî nehatiye kirin.
<b>Beybûn</b>	Papatya	Daisy	Çandinî	Kulîlkeke bibêhn.
<b>Beytar</b>	Baytar	Veterinarian	Çandinî	Bijîşkê/a ajalan.
<b>Bibîne</b>	Bul	Find	Kompîter	Di zanistîya kompîturê de, peyva ku bigire û bigire.
<b>Biçûkkirin</b>	Küçültme	Minimize	Makîne	Kêmkirina tiştêkî.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Bide ber hev :: Daneberhev :: Berhevdan :: Berawird</b>	<b>Karşılaştırmak</b>	Compare(to-)	Kompîter	Ji aliyê mêjera wan ve lêkolîna tiştan an jî di nav xwe de danîna berhev.
<b>Bidest :: Manuel</b>	<b>El ile</b>	Manual	Elektrîk	Çêkirina karekî bi dest.
<b>Bidestkirî :: Destkirî :: Çêkirî</b>	<b>Yapay</b>	Artificial	Maden	Yê/a ku di xwezayê de amade nîn e û ji ber pêdiviyên bi destê mirovan tê çêkirin.
<b>Bidestxistin</b>	<b>Kazanmak :: elde etmek</b>	Acquire (to)	Elektrîk	Bi saya têkoşîn an jî xîretê wergirtina tiştêkî.
<b>Bidomîne</b>	<b>Devam :: Tekrarlamak</b>	Resume	Kompîter	Fermana domandina karê ku berê dest pê kiribe, da ku bidome.
<b>Bidomîne :: Berdevam</b>	<b>Devam</b>	Continue	Kompîter	Ji bo encamgirtinê meşandina kar an jî kirariyekê.
<b>Bigire</b>	<b>Kapat</b>	Close	Kompîter	Fermana girtina bername an jî pergalê.
<b>Biha</b>	<b>Fiyat</b>	Price	Maden	Nirxa bi peretî.
<b>Bihurek :: Derbasgeh :: Derwaze</b>	<b>Geçit</b>	Gate	Elektrîk	Ew xala diyar ku di nava du ciyan de ye û rê tê de diçe.
<b>Bijarte</b>	<b>İşaret</b>	Bookmark	Kompîter	Nişankirin. Hilbijartin.
<b>Bikaranîna avê</b>	<b>Su kullanımı</b>	Water use	Erdnasî	Rêbaza bikaranîna avê.
<b>Bikaranîna erd</b>	<b>Arazi kullanımı</b>	Land use	Nexşe	Ji bo armancên cur be cur xebata li ser erd.
<b>Bikarbon</b>	<b>Karbonlu</b>	Carbonaceous	Elektrîk	Tiştê ku di binemaliya wê de karbon heye.
<b>Bikarhêner</b>	<b>Kullanıcı</b>	User	Elektrîk	Mirovê ku karînan dike.
<b>Bilbil</b>	<b>Bülbül</b>	Nightingale	Çandini	Çûkeke ku her dem dixwîne. Bi dengxweşiya xwe tê nasîn, dirêjahiya wê nêzî 16 cm'yan e.
<b>Bilind</b>	<b>Yüksek</b>	High	Elektrîk	Tiştê ku qama wî pir dirêj be.
<b>Binbar</b>	<b>Yük altında</b>	Under load	Avahî	Ew tiştê ku di bin giraniyê de ye.
<b>Bindeq</b>	<b>Fındık</b>	Hazelnut	Çandini	Fêkiyê ku qalîkê wê hişk û di nava wê de kakilekî gilover heye. Tovê dara bindeqê ye. Ev tov di gelek marmelatan de tê bikaranîn. Li herêma Hizana Bedlîsê jî digihîje.
<b>Binderya :: Jêderya</b>	<b>Denizaltı</b>	Under sea :: Submarine	Maden	Qada ku li binê deryayê ye.
<b>Binêre</b>	<b>Bak</b>	Look	Elektrîk	Bi çavên xwe lê mêze bike.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Binesazî :: Jêrsazî</b>	<b>Alt yapı</b>	Substructure	Avahî	Karên bingehîn ku ji bo avahiyekê pêwîst e, mîna rê, xeta kêzîne, telefon, elektrîk, av, gaza xwezayî û hwd.
<b>Binrûbar :: Bînzê :: Jêrrûbar :: Jêrzê</b>	<b>Nehir yatağı</b>	River bed	Erdnasî	Rêya ku rûbar tê de diherike.
<b>Binwaşê (avahî) :: Binistîr (xaniyên axî) :: Binaxê :: Hîm :: Bingeh :: Bin</b>	<b>Temel</b>	Basic	Avahî	Hêmaneke avahiyê ye ku giraniya avahiyê rasterast digire ser xwe û li zemîna binê xwe belav dike.
<b>Binzemîn :: Binax</b>	<b>Yeraltı</b>	Underground	Erdnasî	Binerd. Binê erdê.
<b>Bîr :: Bîrdank</b>	<b>Hafıza :: Bellek</b>	Memory	Kompîter	Cih an jî amûra ku agahî tê de tomarkirî ne.
<b>Bîr :: Sîba</b>	<b>Kuyu</b>	Well	Avahî	Ji bo deranîna av an jî nefta binzemînê çala ku tê kolan.
<b>Bîra</b>	<b>Bira</b>	Beer	Çandinî	Vexwarina bi alkol. Ji cehî tê çêkirin.
<b>Bîra arasteyî</b>	<b>Yönlü kuyu</b>	Directional well	Erdnasî	Bîra ku di dema birkoliyê de ji ber sedemêke diyar berê wê neşaqolî dibe.
<b>Bîra deranîne :: Bîra hilkêşanê</b>	<b>Nakliyat kuyusu</b>	Haulage Pit(well)	Maden	Bîra asoyî ku ji ruyê erdê heta binê kanê tê çêkirin. Ev bîr ji bo derxistina maden, kerese û xebatkaran tê bikaranîn.
<b>Bîra kûr :: Sîba kûr</b>	<b>Derin kuyu</b>	Deep well	Erdnasî	Bîra bi birkolê (sondaj) kûr hatiye kolandin.
<b>Birc :: Tawir</b>	<b>Kule</b>	Tower	Avahîsazî	Avahiyên bi piranî gilover an jî çargoşeyî yên bilind. Asasê wê avahiyê zêde fireh nîn e.
<b>Birqonek :: Bîrîqedar :: Teyîsî :: Wirşe</b>	<b>Parlak</b>	Bright	Maden	Yê/a ku şewq dide. Rûyê ku ronahiyê dibiriqîne.
<b>Birrîn</b>	<b>Kesme</b>	Cutting	Makîne	Jêkirin. Qetkirin. Qutkirin.
<b>Bîrûsk</b>	<b>Yıldırım</b>	Thunderbolt	Elektrîk	Valabûna barê elektrîkê di nava ewr û erdê de ye.
<b>Bivîr</b>	<b>Balta</b>	Axe	Elektrîk	Alava ku ji bo birîna daran tê bikaranîn.
<b>Bizin</b>	<b>Keçi</b>	Nanny goat	Çandinî	Ajaleke kedî ye, bi taybetî li herêmên çiyayî dijîn. Bêtir pelên daran dixwin.
<b>Boranxane</b>	<b>Güvercinlik</b>	Pigeon loft	Avahî	Avahiya ku kevok tê de tîn xwedîkirin, lîsê kevokan.
<b>Boxesang :: Gîre</b>	<b>Cendere</b>	Clamp	Çandinî	Amûreke guvaştinê, bi taybetî ji ji bo guvaştina tîrî tê bikaranîn.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Bûkanî	Gelincik	Poppy	Çandinî	Kulîkek.
Bûlwar	Bulvar	Avenue	Pilansazên Bajêr	Riya fireh a ku di nava bajêr de wek du beşan çêdibe (çûn û hatin) û navbera her du beşan (refûj) bi daran xemilandî ye.
Bûtik :: Bişkoj :: Çiro	Tomurcuk	Fruit-bud	Çandinî	Zîlên ku di guliyên rehekan de derdikevin û di demeke kin de jê şax, gulî û kulîlk çêdibe.

## C

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Cam	Cam	Glass	Maden	Pêkhateyeke ku ji silîs, soda û potas çêdibe. Bi germahiyêke mezin dihele û teşe digre. Madyek şefaf e û ronahî tê de derbas dibe.
Cax	Merdiven korkuluğu	Balustrade	Avahîsazî	Ji bo parastin û astengkirina ketinê tê bikaranîn. Li kêlaka derence û li kêleka şanşînan tê bikaranîn.
Cd	Cd	Compact Disk :: Cd	Elektrîk	Amureke gilover a ku dane li ser tê nivîsandin û tê xwendin. Di kompîtûrê de tê bikaranîn. Kurtkirina peyva "Compact Disk" e.
CD-ger	CD sürücü :: CD okuyucu	Cd driver :: Cd reader	Elektrîk	Parçeyek ji kompîtûrê ku CD pê tê xwendin û bikaranîn.
Ce:: Ceh	Arpa	Barley	Çandinî	Giyayekî ji familyeya genim.
Cehni :: Canî	Tay( at yavrusu )	Foal	Çandinî	Çêlikê/a mehinê.
Cehtirî :: Catre :: Anûx	Kekik	Thyme	Çandinî	Cureyekî giyayên aromatik û tîbî.
Cemed :: Qerîse	Buz	Ice	Elektrîk	Ava ku ji sermanan dibe qeşa.
Cemser	Kutup	Pole	Elektrîk	1. Xalek ji xalên bi voltajên dijberên hev in ku tezûya (herk) elektrîkê çêdike. 2. Yek ji yên ku dijberên hev in. Mînak; xala herî bakûr a cîhanê, xala herî başûr a cîhanê. Di magnatîsê de aliyê N û S
Cemser	Ucay :: Kutup	Pole	Elektrîk	Yek ji aliyekî seriyên meqletîzê.
Cemsergiri	Düzlemsel ucaylanım :: Kutuplanma	Polarization	Elektrîk	Lihevçivîna barên elektrîkî li cemseran.
Cemserî	Kutupsal	Polar	Elektrîk	Tiştê ku bi cemserê re têkildar e.
Cer	Vida	Screw	Makîne	Bizmarê ku bi zivirandinê bi cih dibe.
Cerbader :: Dernefis	Tornavida	Screwdriver	Makîne	Alava ku cerê dizivirîne.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Cewrik</b>	<b>Enik :: Köpek yavrusu</b>	Puppy	Çandinî	Çêlikê/a dêlikê.
<b>Çihan :: Zemîn :: Erd</b>	Yer küre	Earth	Avahî	Çihan
<b>Cils :: Gêç</b>	Alçî	Plaster	Erdnasi	Cureyekî kevirê spî ye. Formûla wî $CaSO_4 \cdot 1/2H_2O$ e. Kevirê cilsê ku di agir de bê şewitandin û paşê li aşê kevirîn bê hêrandin dibe cils. Di karê avahiyan de tê bikaranin.
<b>Cilşok :: Cilşor</b>	Çamaşır makinesi	Washing machine	Avahîsazî	Makîneya ku cilan dişo û paqij dike.
<b>Çir</b>	Esnek	Flexible :: Elastic	Fizîk	Taybetiya heybera ku bi hêzê şêwe diguherîne û dema hêz radiibe vediguhere rewşa xwe ya berê.
<b>Çirî :: Nermî</b>	Esneklik	Flexibility :: Elasticity	Fizîk	Taybetiya heyberê ya ku bi hêzê şêwe diguherîne û dema hêz radiibe vediguhere rewşa xwe ya berê.
<b>Conega</b>	Boğa	Bull	Çandinî	Gayê tov e. Ji bo hilgirtina dolê tê bikaranîn. Ji goştê wî jî sûd tê werjirtin.
<b>Coulomb (Kolomb) :: Yekeya barê elektrîkê</b>	<b>Coulomb :: Elektrik yük birimi</b>	Coulomb	Elektrîk	Yekeya barê elektrîkê coulomb e. Barê 1 Amper elektrîkê ku di 1 saniyekê de li ser guhêzbarekê diherike. " $C = A \times s$ "
<b>Ctrl</b>	Ctrl	Ctrl	Kompîter	Kontrolkirin. Kurteya peyva "control" e.
<b>Cuda Hilgire :: Cuda tomar bike</b>	Farklı kaydet	Save as	Kompîter	Di kompîturê de belge yan jî dosyayên ku xebat li ser wan tê kirin bi navekî din an jî li cihêkî din bê qeydkirin (tomarkirin).
<b>Cure</b>	<b>Tür :: Tip</b>	Type	Elektrîk	Cureyê vê nivîsê îtalîk e.
<b>Cure :: Cor</b>	<b>Cins :: Tür</b>	Kind	Nexşe	Heyber, zarav, pişe, kom yan jî hwd. a li gora taybetmendiyên çêbûye. Ji ber taybetmendiyên xwe ji hev vediqetin.
<b>Curehiya biyolojîkî :: Curehiya Jîndehî :: Corewcorî zîndeyî</b>	<b>Biyolojik çeşitlilik</b>	Biodiversity	Çandinî	Curbecureya formên zindiyên ên li cihanê.
<b>Cureyê nivîsê :: Font</b>	<b>Font :: Yazı çeşidi</b>	Font	Kompîter	Cureyê nivîsê.


# Ç

Kurdî	Tirkî	Îngilîzî	Beş	Pênase
<b>Çakkirin</b>	Tamirat	Repairs	Makîne	Rastkirin û duristkirina amûr an jî makîneyeke xerabûyî.
<b>Çakûç</b>	Çekic	Hammer	Avahî	Serê wî ji hesin û destiyê wî darîn e. Teşe û giraniya wî li gora karê ku ew ê pê bê kirin diguhere. Ji bo şikandin, pelixandin û çêkirina amûrên hesinî tê bikaranîn.
<b>Çal :: Kort</b>	Çukur	Hole :: Pit	Maden	Çiyê ku li ser ruyê erdê li gor derdora xwe kûr e.
<b>Çalak</b>	Aktif	Active	Elektrîk	Aktîf.
<b>Çandin</b>	Ekim :: Ekme	Planting	Çandinî	Karên belavkirina bizir (tov) li ser axê.
<b>Çandin</b>	Ekim:: Ekmek	Sowing	Çandinî	Ajotina rehekan.
<b>Çandiniya textayî</b>	Dûze ekim	Flat planting	Çandinî	Çandiniya ku bi rêzî (xet) tê kirin.
<b>Çandinkar :: Çandinvan</b>	Tarımcı :: Ziraatçı	Agriculturist	Çandinî	Cotyar. Kesê ku li ser çandiniyê perwerde dîtiye. Kesê ku karê çandiniyê dike.
<b>Çap</b>	Baskı :: Yazdırmak	Print	Kompîter	Bi alikariya kompîturê, ji çaperê derxistina nivîs an jî wêneyan.
<b>Çaper</b>	Yazıcı	Printer	Kompîter	Amûra bi kompîturê ve girêdayî ye û ji bo derxistina nivîs an jî wêneyan li ser kaxiz tê bikaranîn. Du kablo dikevin vê amûrê, yek ji bo enerjîyê (elektrîk), ya din jî ji bo agahiyê(data) ye.
<b>Çarçove</b>	Çerçeve	Frame	Elektrîk	1. Ji bo xemilandin û daleqandina wêne, nivîs, eynîk hwd. nexşeya dorê. 2. Di komînkasyonê de şandina beş an jî parçeyekî daneyê. Ji bo dane bi ewlehî û zêdetir bê şandin weke frame tê pêçan û şandin.
<b>Çavî :: Çavik</b>	Gözenek	Pore	Maden	Ji bo her qula tiştê qulqulik.
<b>Çavkani :: Jêder</b>	Kaynak	Source	Elektrîk	Çih an jî heyberên ku jê enerjî (elektrîk, elektromagnetîk, ronahî, av, hwd.) dertê.
<b>Çawani :: Sima :: Sexlet :: Senini</b>	Nitelik	Feature	Maden	Taybermendiya ku madeyekê ji yên din vediqetîne.
<b>Çêlek :: Manga</b>	İnek	Cow	Çandinî	Ajaleke kedî ye, ji goşt, şîr û çermê (eyar) wê sûd tê girtin.
<b>Çêlik :: Têjik</b>	Yavru	Nestling	Çandinî	Têjikên çûkan.
<b>Çem</b>	Çay	Rill	Çandinî	Ava herikbar. Rûbarê biçûk.
<b>Çeng :: Zengil :: Zeng</b>	Çan :: Zil	Bell	Avahîsazî	Amûra dengdêr a ji bo hişyariyê. Metaleke qewartî û di navê de hesinekî (zimanok) heye ku dema ev hesin dileqe û li kêleka metal dikeve deng dertê.



Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Çerxa dirandar :: Çerxî dandar</b>	Dişli	Gear	Makîne	Alaveke wek dîsk (gilover) û dora wê niçiroki ye. 
<b>Çikilandin</b>	Dikmek	Prick	Elektrîk	Sekinandina stûnî ya tiştêkî di cihêkî de. Sekinandina tiştêkî yan cîsmekî bi qulkirinê yan jî bi kolanê bi awayekî çîk.
<b>Çilmisîn</b>	Solma	Wanning	Maden	Di warê kîmyayî de pigmenta ku rengê xwe winda kiriye.
<b>Çîm :: Firîz :: Çîmen</b>	Çîm	Lawn	Çandinî	Cureyekî giyayê jî famîlyeya genim e, jî bo şinahiya park an jî baxçeyan tê bikaranîn. Giyayekî pirsalî ye.
<b>Çinandin :: Dirûn</b>	Biçmek	Reap	Çandinî	Hilberîniya riwekan.
<b>Çinin</b>	Biçmek	Reap: Mow	Çandinî	Karê çinandinê.
<b>Çir :: Nerm</b>	Esnek	Flexible	Fizîk	Taybetiya heyberê ya ku bi hêzê şêwe diguherîne û dema hêz radibe vediguhere rewşa xwe ya berê.
<b>Çirî</b>	Özkûtle	Mass density	Fizîk	Mêjera made ya di yekeya qebareyê de. Çiriya avê 1 gr/cm <sup>3</sup>
<b>Çirik :: Çiranek</b>	Çörtên	Gargoyle	Avahîsazî	Çihoka jî bo ava barana ku li ser banan kom dibe, jî asasê avahiyan jî dûr direşîne.
<b>Çiziran :: Avzen</b>	Sızıntı	Seepage	Maden	Di kanê de zayîna avê. Dema av di kanê de dizê.

## D

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Dabeş :: Îfraz</b>	Ayırma	Subdivision	Nexşe	Ji hev veqetandina erd. Parçekirina parsêlan. Parselek piştî îfrazê dibe jî yekê zêdetir. 
<b>Dadgeh :: Edliye</b>	Adliye sarayı	Courthouse	Avahîsazî	Avahiya ku karên hiqûq û dadmendiyê lê tên meşandin.
<b>Damara Madenê :: Reha madenê :: Rega madenê</b>	Damar	Vein :: lode	Maden	Xeta ku di bin erdê de gewher tê de kom bûye.
<b>Danan :: Danîn :: Sazkirin</b>	Tesis etmek :: Kurmak	Installation	Makîne	Avakirina pergala (sîstem) an jî amûreke.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Danberhev :: Berawirdî</b>	Karşılaştırma	Comparasion	Elektrik	Muqayesekirin.
<b>Danüstendin</b>	Alım satım	Trade	Aborî	Pêkanîna bazirganiyê. (Ticaretê)
<b>Dara Kizwanê :: Dara şengêlê :: Dareben :: Dara benîştê</b>	Bitim ağacı	Pistacia eurycarpa yalt	Çandinî	Dareke ku orjîna wê ji Kurdistanê ye. Ji fêkiya wê qehwe, sabûn, tizbi tèn çekirin. Famîlyeyeke darên pelfreh e. Makedara fistiqê ye.
<b>Darêj</b>	Döküm	Casting :: Dump	Makîne	Ji bo teşedayîna metalan helandin û rijandina nava kalib. 
<b>Daristan</b>	Orman	Forest	Çandinî	Qada daran.
<b>Dariştaya kanzaya req :: Amêjeya metala req</b>	Sert metal alaşımı	Hard-metal alloy	Maden	Amêjeya metal a ku dijwar e. Mînak; Pola, Tûnc
<b>Das :: Şalok</b>	Orak	Reaping-hook	Çandinî	Amûreke ku ji bo birîna hejik, qirşik, giya û hwd. tê bikaranîn.
<b>Dawîn :: Paşin</b>	Son	Last :: End :: Stop	Maden	Tiştê ku li herî paş maye, li dawiyê ye.
<b>Dazelandin :: Parzîndandin :: Dawerivandin :: Sefandin</b>	Süzme	Filter	Elektrik	Heke çend tiştên cuda (dibe ku ev tişt maddeyên şilek an jî agahiyên cuda bin) di nav hev de bin û mirov bixwaze wan ji hev veqetîne mirov karê "dazelandin"ê dike. Mirov wan tiştan dadzelîne.
<b>Def :: Dahol</b>	Davul	Drum	Elektrik	Def amûreke muzîkê ye. Def ji text û eyarê (çerm) ajalan çêdibe. Textikê tenik tê tewandin û dikeve şeweyê rûloyekê piştê jî aliyekî rûloyê (silîndîr) bi eyarê tê girtin. Dema tiştê li eyarê dikeve deng jê dertê.
<b>Dehşik :: Ceş</b>	Sıpa	Colt	Çandinî	Têjîkên keran.
<b>Dêlegur</b>	Dişikurt	Female wolf	Çandinî	Gura mê.
<b>Dêlî :: Mêw</b>	Asma (üzüm bağı)	Vine (vineyard)	Çandinî	Dara tirî.
<b>Dêlik</b>	Kancık :: Köpeğin dişisi	Female dog	Çandinî	Kûçika mê.
<b>Demana :: Kîrê</b>	Kiralamak	Rent	Çandinî	Tiştê ku ji aliyê xwediyê wî ve ji bo demekê û bi buhayekî tê dayîn.
<b>Demjimêr</b>	Saat	Watch	Maden	Çîhaza ku demê nîşan dide.


<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Demsalî :: Werzî</b>	<b>Sezonluk :: Mevsimlik</b>	Seasonal	Maden	Tiştê ku li gorî hewayê tê bikaranîn.
<b>Deng</b>	Ses	Sound	Elektrîk	Bi guh tê bihîstin (sekirin). Axaftin bi alîkariya dengê ku ji gewriya mirov dertê çêdibe. Dema made dilerizin deng dertê holê.
<b>Dengpîv</b>	<b>Ses ölçer</b>	Phonometer	Elektrîk	Amûra ku pê hêza deng tê pîvandin.
<b>Dep</b>	<b>Kalas</b>	Timber :: Wood :: Plank	Avahî	Darên çargoşe yên kêm zêde ku firehiya wan 30-50 cm, bilindahî 10 cm û dirêjahî jî bi qasî 3-4 metreyan e. Ev dar di karên mobilya, avahî û çêkirina avahiyên de tîn bikaranîn.
<b>Depokirina avê :: Embarkirina avê</b>	<b>Su depolama</b>	Water storage	Maden	Komkirina avê di liçekê de.
<b>Dêr</b>	<b>Kilise</b>	Church	Elektrîk	Perestgeha xirîstiyanan e. Avahiya ku xirîstiyân tê de îbadetên xwe dikin.
<b>Derbasdar</b>	<b>Geçerli</b>	Valid	Elektrîk	Tiştê ku tê pejrandin. Tişt an jî rewşa ku erênî ye.
<b>Derbasdarî</b>	<b>Geçerlilik</b>	Validation	Elektrîk	Rewşa pejrardina tiştan.
<b>Kêzik</b>	Böcek	İnsect	Makîne	Bi giştî haşeratên biçûk.
<b>Kêzhatûn :: Xalxalok</b>	Uğur böceği	Ladybug	Avahîsazî	Kêzikeke bi rengê sor e û li ser baskên wê deqên reş hene. Li gorî bawerîya gel, ev kêzik mizgîna zewacê jî mirovan re tîne.
<b>Kifş :: Berçav</b>	Açıkta	In the open	Elektrîk	Li ciyê dîtî, bereçav, vekirî, bi zelalî. Ji aliyê her kesî ve tê ditin. " Kifş e ku dê ev kar di nava saetekê de biqedê".
<b>Kil :: Kilê çavan</b>	Sürme :: Göz sürmesi	İsmit	Makîne	Boyaxa ku di binê mijangan tê dayîn.




<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Kilîma :: Baxoşk</b>	<b>Klima</b>	Air Conditioner	Makîne	Amûra ku germahiya hundir kontrol dike, germahiyê kêm dike yan jî ku sar be germahiyê zêde dike.
<b>Kîmya :: Kîmye</b>	<b>Kimya</b>	Chemistry	Makîne	Zanistekê ku avaniyên madeyan, pêkhatina wan, veguherîna xwe bi xwe, dahûrandin, sentez û rêyên hilberîna wan madeyan vedikole.
<b>Kîmyayî :: Kîmyewî</b>	<b>Kimyasal</b>	Chemical	Makîne	Tiştên girêdayî kîmyayê.
<b>Kinbûn :: Têkçûn</b>	<b>Kısalma</b>	Shrink	Elektrik	1-Di bernamêyên kompîturê de, di cîyekî de biçûkkirin û biçûkirina wêne, nivîs, şeweyekî û hwd. 2-Biçûkbûn an jî qermiçîn. Gihîştina hev.
<b>Kindir :: Werîs</b>	<b>Halat</b>	Rope	Makîne	Bi lihevgerandina lifên wek pembo, kindir, gûzên hindê û bi tîlên pola ve pêkhatina tayên stûr.
<b>Kindirê kanê</b>	<b>Ocak halatı</b>	Mining rope	Elektrik	Xalatê, kindirê ku xwe pê berî nava kanê didin.
<b>Kiriyar :: Abone</b>	<b>Abone</b>	Subscriber	Elektrik	kesê/a ku tiştên bi awayekî periyodîk an jî li gorî rêzêkê li du hev tîn belavkirin, dikire. "Ez kiriyarê vê kovarê me."
<b>Kişan</b>	<b>Genleşme</b>	Expantion	Fizik	Firehbûn an zedebûna qebareyekê bi bandora tîn û pesto ya li ser cismekî ku baristeya wê neguherbar be.
<b>Kivî</b>	<b>Kivi</b>	Kiwi	Çandini	Fêkiyê tropîk e. Qalîkê wê tenik û bi pirç e, nava wê nerm, kesk û bi av e. Tehma wê tîrş, miz, şîrîn û mir e. Vitamîna C tê de zêde ye.
<b>Kizwan :: şînok :: Şengêl</b>	<b>Melengiç :: Menengiç</b>	Pistacia terebinthus	Elektrik	Yek jî cureyên nebatan e. Jê qehwe yan jî sabûn tê çêkirin.
<b>Klişe</b>	<b>Klişe</b>	Cliche	Makîne	1-Ji bo çapkirinê li ser lewheyê belkirina (qalibkirina) şewê, nivîs an jî wêneyan. 2- Gotin, fikrên hwd. Klişe (ji aliyê her kesî ve tê zanîn.) " Nivîskar xwe pir dipesînîne lê tiştên nivîsîne jî tev klişe ne."
<b>Kobalt</b>	<b>Kobalt</b>	Kobalt	Maden	Gewherek.
<b>Kodkirin</b>	<b>Şifreleme: Kodlama</b>	Encoding	Kompîter	Li ser pergalekê veşartin.
<b>Koka zil</b>	<b>Kamış kökü</b>	Phelypaea phermites australis(cav) trinex ex steudel	Çandini	Koka nebateke ku ji familyeya genim e, gewdeyê wê hişk e, li cîyê bi hêman jî avî şîrîn dibe.
<b>Kolan</b>	<b>Kazı</b>	Excavation	Avahî	Vedana axê.
<b>Kolandin</b>	<b>Kazmak</b>	Dig	Avahî	Bi afikariya amûrekî kûrkirina erdê. Vedan an jî valakirina axê.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Kole</b>	<b>Köle</b>	Slave	Çandînî	Mirovên dîl .
<b>Kolomb :: Coulomb</b>	<b>Kulomb</b>	Coulomb	Makîne	Paşnavê camêrekî navdar e. Di endezariyê de pîvana yekîneyê ye.
<b>Kolyar</b>	<b>Kazıcı</b>	Excavator	Elektrîk	1-Makîneya ku erdê dikole. 2-Kesê ku karê kolanê dike.
<b>Kolyarî</b>	<b>Kazıcılık</b>	Digger	Elektrîk	Karê kolanê.
<b>Kombûn</b>	<b>Birikmek</b>	Accumulate	Makîne	Tiştên ku bi ser hev de kom bibe. (Av di birkê de kom bû.)
<b>Kombûn :: Kelekebûn</b>	<b>Birikme</b>	Cumulation	Maden	Bi demê re zêdebûna li cihêkî.
<b>Komîsyon</b>	<b>Komisyon</b>	Commision	Makîne	Ji bo kar an jî xebatekê avakirina komên biçûk. "komîsyona xebata zaravên teknîkî"
<b>Komkirin</b>	<b>Toplama</b>	Collection	Fîzîk	Berhevkirin, danhevî. Tiştan li gorî bikêrhatin an jî ji bo kêfa xwe berhevkirin û li gorî taybetmendîya wan dabêşandin. Koleksiyona cil û bergan.
<b>Kompresor :: Pestêner</b>	<b>Sıkmaç :: Kompresör</b>	Compressor	Elektrîk	Makîneya ku madeyên şilek (herkoyî) an jî gazê li gorî pestoyê dîşîdîne.
<b>Komxanî</b>	<b>Toplu konut</b>	Mass housing	Pilansazên Bajêr	Avahiyên bi hev ve girêdayî yên ku bi alîkarî yan jî piştigiriya dewletê ji bo hemwelatîyan hatine avakirin
<b>Konferans</b>	<b>Konferans</b>	Conference	Elektrîk	Axaftinên ku li hemberî civatekê ji bo agahîdayina der barê mijarekê de. "Konferansa li ser zimên sibê dest pê dike."
<b>Kor</b>	<b>Kör</b>	Blind	Elektrîk	1-Windakirina hêza dîtinê. 2-Ketina ji nirx, windakirina qabiliyeta xwe. 3-Windakirina (pejnkerî) hestiyariyê.
<b>Korniş</b>	<b>Korniş</b>	Cornice	Avahîsazî	Amûrên ji bo daliqandina perdeyan. Dibe ku metal an jî plastîk bin.
<b>Korozyon :: Zeng :: Mehîna kîmyewî</b>	<b>Kîmyasal aşınma :: Korozyon</b>	Corrosion	Elektrîk	Bi derbasbûna demê, bi oksîjena hewayê re zengirtina madeyên hesinî. Kevnbûna kîmyewî.
<b>Kovar</b>	<b>Dergi</b>	Journal	Elektrîk	Weşanên periyodîk yên ku li ser mijarekê teknîk, wêjeyî, siyaset û hwd. Disekinîn.
<b>Kox</b>	<b>Kümes</b>	Coop	Çandînî	Ciyên girtî ji bo starbûna ajalên kedî wek mirîşk, elok û hwd.
<b>Kozik</b>	<b>Mevzi</b>	Positions	Makîne	Ciyê xweparastinê.
<b>Kozmîk :: Gerdûnî</b>	<b>Kozmik</b>	Cosmic	Elektrîk	Têkiliya bi kaînatê, yan jî têkiliya bi pergala (nîzama) kaînatê re.


<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilîzî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Krîstal</b>	<b>Krîstal</b>	Crystal	Elektrîk	1. Şêweyên hişk û homojen ên ku ji parçeyên camê bi awayê geometrîk hatine rastkirin, çêdibin. Nava wan rast û sîmetrîk e. Dema ronahî li krîstalê dikeve rengên cuda derdikevin holê. 2. Madeyên hişk ên ku atomên wan li gorî rê û rêbazan, şêweyên geometrîk rêz bûne.
<b>Krokî :: Nexşe</b>	<b>Kroki</b>	Plan	Makîne	Amadekirina gelalayên ji bo diyarkirina taybetmendiyên sereke yên mijarekê yan jî yên tiştêkî.
<b>Krom</b>	<b>Krom</b>	Chromium	Makîne	Elementeke kîmyayî ye. Numreya wê ya atomê 24 û kurteya wê "fr" ye.
<b>Kronolojî</b>	<b>Kronoloji</b>	Chronology	Elektrîk	Listeya bûyerên li gorî demê rêz kirî.
<b>Kuark</b>	<b>Kuark</b>	Quark	Makîne	Pariya bingehîn û perçeya bingehîn a madeyê ye.
<b>Kûçik :: Se</b>	<b>Köpek</b>	Dog	Makîne	Ajalekî kedî, bêhnê pir baş distîne, ajalekî dilsoz e, ji bo peywirên pawantî û neçirvaniyê tê xwedîkirin.
<b>Kufik</b>	<b>Küf</b>	Mold	Elektrîk	Piştî xerabûnê, çûna ber bi petandinê ve ye. Madeyên wek nan, penêr û hwd. ên organîk bi bandora hêman (xenam) û germiyê xera dibin.
<b>Kufikî</b>	<b>Küflü</b>	Moldy	Elektrîk	Tiştê ku wextê wî derbas bûye, kevnar e. "Nanê kufikî."
<b>Kufikîbûn</b>	<b>Küflenmek</b>	Mildew	Makîne	Tiştê ku taybetiyên xwe yên erênî winda bike. (Ji ber betalbûnê kufikî bû. Fêkiyên li derve kufikî (xera) bûn nayên xwarin.)
<b>Kuleka hewayê :: Bakêş</b>	<b>Hava bacası</b>	Air hole :: Vent hole	Avahîsazî	Kuleka ji bo kêşana hewayê.
<b>Kulîlk</b>	<b>Çiçek</b>	Flower	Çandînî	Gulên rehekan.
<b>Kuncî</b>	<b>Susam</b>	Sesame	Çandînî	Nebateke ku li cihên germ digihîje. Ji tove wê rûn çêdibe, ji hijikên wê jî ardû çêdibin.
<b>Kund</b>	<b>Baykuş</b>	Owl	Çandînî	Ajaleke perinde û kovî.
<b>Kûr</b>	<b>Derin</b>	Deep	Makîne	Ciyên ku ji rûyê erdê ber bi jêr ve ye. (Ji ber ku li gund av kêmbû, bîreke kûr kolan û av derxistin.)
<b>Kurîbeşk</b>	<b>Porsuk</b>	Badger	Çandînî	Ajaleke kovî ye. Bi goşt û giya xwedî dibê. Dirêjahiya wê bi qasî 70 cm, teriya (qemçîk) wê 17 cm e.
<b>Kûrkirin</b>	<b>Derinleştirmek</b>	deepen	Erdnasî	Bi kûr de çûyîna ciyekî an jî zemînekê.
<b>Kurm</b>	<b>Solucan</b>	Worm	Elektrîk	1-Di bendavên ji bo çêkirina elektrîkê de parçeyek e ku şêweyê wî gulover e. 2-Ajaleke ji familyeyên bê marîpişt, gulover, pehn û dirêj.
<b>Kursî</b>	<b>Sandalye :: Îskemle :: Kürsü</b>	Chair	Makîne	Alava rûniştinê. Rûnişteke.

# L

Kurdî	Tirkî	Îngilîzî	Beş	Pênase
<b>Laborant :: Taqiger</b>	Laborant	Laborant	Elektrîk	Xebatkarên teknîker ê ku di laboratûarê de lêkolînê dike yan jî dixebite.
<b>Laboratûar :: Taqigeh</b>	Laboratuar	Laboratory	Elektrîk	Ciyê ku lêkolîn û ezmûn lê tên kirin.
<b>Lafîafoka kulîlk sor</b>	Kırmızı çit sarmaşığı	Lonicera xylosteum	Çandinî	Riwekeke ku hildikişê û li dora dar, dîwar an jî stûnan dilefe.
<b>Lajwerd</b>	Metal	Metal	Makîne	Taybetiyên giran, şid, biriqok, kutandinê diyar dike û raqihbarên baş jî bo tîn û karebayê ne.
<b>Lastîk</b>	Lastik	Rubber	Fizîk	Madeyekî nerm û elastîk e. Gewhereke ji nava petrolê derdikeve ye.
<b>Lat</b>	Parsel	parcel	Nexşe	Parkirina aqarekê li gor zagona pêşnûmakariya avadaniyê.
<b>Lazer</b>	Lazer	Laser	Makîne	Teysên pir bi hêz çêdike û kaniya roniyê ya ku di qadên cuda de tê bikaranîn e.
<b>Lêbarkirin</b>	Yüklemek	Upload	Komputer	Lê girtina, barkirina agahî, dane yan jî dosyayan, li komputer, disk an jî li kartê birê.
<b>Lebat :: Organ</b>	Organ	Organ	Elektrîk	Di bedenê (gewde) de her parçeyê ku peywireke wî ya taybet heye. Di nav organizmayan de ji parçeyên ku xwedî peywirên taybet in re tê gotin.
<b>Lebzîne :: Almas</b>	Elmas	Diamond	Maden	Gewhereke giranbuha, qîmetdar. Elementa karbonê ya arî ye. Tê zanîn ku madeya herî hişk lebzîne ye. 
<b>Lêçûn</b>	Harcama :: Gider	Expenditure	Aboî	Ji bo karekî ji mesrefên tevahî re tê gotin. Bi tevahî xerckirina pere, ked hwd.
<b>Lef:Pêç</b>	Sarım	Winding	Elektrîk	1. Ji bo qaada manyetîkê bê çêkirin, her dorek têla sifir ku li ser kakilê hesin tê pêçan. Di hundirê trafoya elektrîkê de li ser kakil lef hene. 2. Rewşa benik li dora teşiyê.
<b>Legan</b>	Leğen(küçük)	Basin (small)	Maden	Amûreke pehn û gilover jî bo şuştin, pakirin an jî jihvecudakirina cureyên kevir, xîz û hişkiyên din.
<b>Legleg</b>	Leylek	Stork	Çandinî	Cureyekî çûkan e.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Lehî</b>	Sel	Flood	Elektrîk	Ava pir û rabûyî ku di ciyê derbas dibe (rûbar, çem. . .) de ziyanan dide. Bi piranî piştî barana domdar an jî piştî helîna berfê dertê holê. Wexta lehî radibe xweza û mirov zîrê dibînin.
<b>Lêjî</b>	Şev	Slope	Erdnasî	Rûyê hevraz, nişov an jî berpal. Kêleka rê ku hinekî çal e.
<b>Lêketin</b>	Değmek	Touch	Maden	Li tiştê ketin.
<b>Lêkolîn</b>	Araştırma	Research	Maden	Xebat û lêhûrbûna li ser mijarekê.
<b>Lenger</b>	Köprü ayağı	Abutment	Avahî	Asasê lingê pirê.
<b>Lepik :: Destgorik</b>	Eldiven	Gloves	Makîne	Ciên ku destan ji serma, germî, qirêjî û ji derbeyan diparêzin.
<b>Lerizîna neahengdar</b>	Uyumsuz titreşim	Anharmonic vibration	Elektrîk	Di enerjîyê de lerizîna ku frekansa wan ne standart e.
<b>Lerzegraf :: Sismograf</b>	Sismograf	Seismograph	Erdnasî	Amûra ku erdhêjê dipîve. Mawe, lerz û cihê erdhêjê dipîve, li ser xazekî dinivîse.
<b>Lerzeyî :: Sismîk</b>	Sismîk	Seismic	Erdnasî	Tevgera li ruyê erdê.
<b>Lerzewanî :: Sismolojî</b>	Sismoloji	Seismology	Erdnasî	Lêkolîna zanista erdhejê ye.
<b>Lerzpîv</b>	Titreşim ölçer	Vibrometer	Erdnasî	Tiştê lerzînê dipîve.
<b>Lêşaw</b>	Flaks	Flux	Fizîk	Çendaniya made yan jî tîrêjê ya ku di yekeya demê de di yekeya rûxarê de derbas dibe ye. Herikîna avê ya di cihokê de. Livîna bayê ya di lûleyekê de.
<b>Lêteng kirin</b>	Kıstırmak	Pinch	Elektrîk	Dorgirtin, an jî di nava du tiştan da hiştin.
<b>Lêv</b>	Dudak	Lips	Çandini	Lebata di dev de, a ku diranan dipêçe. Conta yan jî dûzitiya ber dev.
<b>Lêxistin :: Lêdan</b>	Vurmak	Hit	Elektrîk	Bi lezgîni li cihêkî xistina tiştêkî.
<b>Lez</b>	Hız	Velocity	Makîne	Maweya guherîna ciyê cismekî ya di unîteya demekê de.
<b>Li dor :: Dorandor</b>	Etrafında	Around	Elektrîk	Çar alî. "Li dora Amedê çiya hene."
<b>Li ser</b>	Üstünde :: Yukarısında	Above	Elektrîk	Li jorî, raserî tiştêkî yan jî tiştêkî pirtir.
<b>Lib :: Heb</b>	Hap	Pill	Maden	Tiştê ku yek bi yek tê jimartin û komkirin.
<b>Lihêm :: Likan</b>	Lehim	Solder	Elektrîk	Madeya pêkhatî ya ji risas û pîl (qela) çêdibe, ji bo kelijandina metalên ku nahelin tê bikaranîn. Di vedorê (circuit) elektronîk de ji bo metalan bi hev ve bizeliqînê li hêm tê bikaranîn.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Lihêmkirin :: Likandin</b>	Lehimlemek	Solder	Elektrik	Karê lihêmê.
<b>Lihevkin :: Peymandanîn</b>	Anlaşmak	Agree	Elektrik	1. Lihevhatina li ser karekî, xebatekê yan jî listikekê. Parvekirina heman fikrê. 2. Di teknîkê de pejirandina şertan.
<b>Likandin :: Coşdan :: Keldan</b>	Kaynak	Weld	Makîne	Bi hev ve danîna du metalan bi alîkariya tînê.
<b>Likandiner :: Coşkar :: Keldankar</b>	Kaynakçı	Welder	Avahî	Kesê ku karê keldanê (coş, likandin) dike.
<b>Ling :: Pê</b>	Ayak	Foot	Makîne	Lebateke laşî ye, biyolojîk e, bi piraniya zindiyên ve heye û ji bo tevgerê tê bikaranîn.
<b>Lîste</b>	Liste	List	Elektrik	Ji temamê tiştên di bin hev de hatine nivîsandin re tê gotin, lîste. "Karsaz ji ji bo karê me yê îro lîstekeke dirêj da me."
<b>Lîstik</b>	Oyun	Game	Makîne	Tevgerên li gora hin rêbazan tên kirin û encamê jê tê girtin.
<b>Lîtav :: Hezek :: Cîmcime :: Zongav</b>	Bataklık	Swamp	Erdnasî	Li ser zemîneke kort û avtênehîrî de berhevûna herî û ava baranê yan jî ava avzêmekê.
<b>Lîtosfer</b>	Litosfer	Lithosphere	Erdnasî	Avaniyê li dinyayê ye, di tebeqeyên bejahiyê de ya herî li derve ye. Stûrbûna wê nêzî 33 km'yan e. Ji vê avaniyê re Gogîrd jî tê gotin
<b>Lîtyûm</b>	Lityum	Lithium	Makîne	Elementeke kîmyayî ye. Numreya wê ya atomê 3 ye û bi kurteya "Li" tê nîşandan.
<b>Livandin :: Libitandin</b>	Hareket ettirmek	Move	Maden	Bi rêya tehndan û leqandinê hereketkirina tiştêkî.
<b>Lîwan :: Eywan</b>	Salon	Sallon	Avahîsazî	Menzela mezin, eywan.
<b>Lixwegirtin</b>	Taahhüt	Commitment	Erdnasî	Girtina ser xwe ya berpirsiyariya karekî.
<b>Lojistik</b>	Lojistik	Logistics	Makîne	Zanistê ji bo çalakiyên bidebaxstina sûxre û mal; plangeî, birêxistinkirin û rêveberî ye.
<b>Lûle :: Borî</b>	Boru	Pipe	Fizîk	Ji bo ku madeya şilek, gaz û madeyên mîna vana ji cihê ber bi cihê din ve werin veguhastin tê bikaranîn. Av an jî ba ji seriyê dikeve û ji seriyê din derdikeve. Dişibe silîndîrêkê (rûlûlek) nava wî vala.


Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Lûleya pestan-berz :: Lûleya pestan-bilind	Yüksek basınc borusu	High-pressure pipe	Makîne	Lûleya ku di bin bandora pestoya zêde de dixebite.
Lûlpêç	Helezon :: Spiral	Spiral	Fizik	Şeweyê xêza li dora lûleyekê lefandî. Şeweyekî simetrik e. 
Lütesyûm	Lütesyum	Lutecium	Makîne	Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 71 e û bi kurteya "lu" tê nasîn.

## M

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Macûn :: Mom	Macun	Caking compound	Elektrîk	Madeyê ku bûye wek hevîr. Ji bo girtina derz û girtina navbera tiştan (wekî cam) tê bikaranîn.
Macûnkirin :: Momkerdey	Macunlama	Caking	Elektrîk	Karê kirina macûnê.
Madeyê tiwawe	Çözünen Madde	Solute	Kîmya	Di gîraweyan de madeyên ku di nava şilek de hûr dibin û bi parçeyên ku bi çav nayên dîtîn belav dibin. Mînak; Şekirê nava avê.
Madeyê tiwêner	Çözücü Madde	Solvent	Kîmya	Di gîraweyan de madeya ku di nava xwe de madeyên din hûr dike û bi parçeyên ku bi çav nayên dîtîn belav dike. Mînak; Di şerbetê de av madeya tiwêner e.
Mafê gelemperî	Kamu hakkı	Civil right	Pilansazên Bajêr	Mafên zagonî yên hemwelatîyan.
Magnezyûm	Magnezyum	Magnesium	Makîne	Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 12 e û bi kurteya "mg" tê nasîn.
Make	Anaç	Stock	Çandinî	Darên ku fekiyan didin.
Makro	Makro	Macro	Elektrîk	Dijberî mikro, fireh, mezin . "Ew proje di planên makro de cih digire."
Mal	Anasayfa	Home	Kompîter	Di kompîturê de destpêk, rûpela destpêkê. Rûpela herî pêş a yekem ku agahîyan der heqê naverokê de dide, di dosyayekê yan jî rûpelên ku di înternetê de ji bo mijarekê hatine ava kirin.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Mal :: Serrûpel</b>	<b>Ev</b>	Home	Kompîter	Di malperê de rûpela destpêkê yan jî destpêk.
<b>Male</b>	<b>Mala</b>	Trowel	Avahî	Alava ku mirov pê xerca dîwar û ciyên din rast dike.
<b>Malika dehan :: Xaneyê dehan</b>	<b>Onlar hanesi</b>	Decimal place	Elektrîk	Di matematîkê de hejmarê ji rastê ve di rêza duduyan de. Nîrxê wê hejmarê, hejmar çî be ew qas car li dehe.
<b>Malper</b>	<b>Înternet sitesi</b>	Web page	Elektrîk	Di înternetê de li ser hînek mijaran jî aliyê kes an jî saziyan ve rûpelên ku jî bo agahî yan jî şahiyê (bezmê) hatine çêkirin. "Navnîşana malpera ku endezyarên Kurd jî bo xebatê li ser zimanê Kurdî çêkirine "www.endezyar.org" e.
<b>Malpera nûçeyan</b>	<b>Haber sistesi</b>	News site	Elektrîk	Di înternetê de rûpelên jî bo agahiyên bûyeran an jî jî mijarên rojane hatine avakirin.
<b>Mandali :: Lalengî</b>	<b>Mandalina</b>	mandarin	Çandinî	Fêkiyê jî malbata narinciyên e.
<b>Manganez</b>	<b>Manganez</b>	Manganes	Makîne	Bi navê mangan yan jî manganezê tê nasîn. Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 25 e û bi kurteya "mn" tê nasîn.
<b>Mango</b>	<b>Hint kirazî</b>	Mangifera domestica	Çandinî	Ji famîlyeya simaqê fêkiyê tropîk.
<b>Mar</b>	<b>Yılan</b>	snake	Çandinî	Ajaleke kişok, xwe bi erdê ve kaş dike.
<b>Mastar</b>	<b>Mastar</b>	Float	Avahî	Alava ku jî bo sererastkirina sewax û şebê tê bikaranîn.
<b>Maşîk</b>	<b>Maşa</b>	Tongs	Makîne	Amûreke lajwerdî ya bi du milan e. Ji bo girtina tiştên wek agir an jî pereng û jî bo lihevixistina perengan tê bikaranîn.
<b>Mat (rengê sar)</b>	<b>Mat</b>	Opaque	Avahîsazî	Rengê ku nabiriqe.
<b>Mazot</b>	<b>Mazot</b>	Diesel	Makîne	Cureyêkî sotemeniyê ye û bi piranî di erebeyan de bi kêr tê. Bi dawerivandina petrola xam bi dest dikeve.
<b>Megawat</b>	<b>Megawat</b>	Megawatt	Makîne	Watt yekîneya hêzê ya yekteşe ya navneteweyî ye. Megawatt jî wattê milyon qatî zêde ye.
<b>Mehandin :: Daxuran</b>	<b>Aşındırmak</b>	Erode	Elektrîk	Ziravkirina bi bihevûnê (lêketinê). Mirov dikare rûberekî bi madeyê jî wî rûberî hişkîrî bimehîne. "Serê wê kêrikê mehandî ye."
<b>Mehîn :: Mehan</b>	<b>Aşınma :: Yıpranma</b>	Wear	Elektrîk	Kevnûn an jî peritîna bi demê re.
<b>Mekanîzma</b>	<b>Mekanizma</b>	Mechanism	Makîne	Ji bo bîdestxistina encameke diyarkirî; pevrûniştina parçe an jî lebatên verastkirina tevlihev. Pergal, sazgerîn. (mekanîzma)



<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Melêv</b>	Yaba	fork	Çandinî	Amûrek e li benderê tê xebitandin.
<b>Melêva hesinî</b>	Demir yaba	Iron forks	Çandinî	Amûrek e li benderê tê xebitandin.
<b>Meme</b>	Meme	Nozzle	Makîne	Di motorê de ji bo benzîn an jî dîzel pêkeve tê bikaranîn. Dîzelê dipijiqîne nava piston.
<b>Menu</b>	Menü	Menu	Kompîter	Lîsteya ferman an jî vebijêrkan.
<b>Mer</b>	Bel: Kazî küreği	Digging shovel	Çandinî	Bêra kolanê.
<b>Mêrg</b>	Çayrılık	Meadow	Çandinî	Parzemînên ku bo çêrandina ajalan tên bikaranîn.
<b>Mêrg</b>	Mera	Grassland	Çandinî	Parzemînên ku bo çêrandina ajalan tên bikaranîn.
<b>Mertal</b>	Kalkan	Shield	Makîne	Amûra ji bo parastinê tê bikaranîn.
<b>Mêşa spi</b>	Beyaz sinek	Whitefly	Çandinî	Ajaleke ji koma kêzikan.
<b>Mêşin:: Mih</b>	Koyun	sheep	Çandinî	Ajaleke kedîkirî.
<b>Mêşlok :: Kêz :: Kêzik</b>	Böcek	Insect: bug	Çandinî	Ajalên heşerat.
<b>Mêşloknasî</b>	Böcek bilimi	Insect science: entomology	Çandinî	Zanista ku mêşan dide nasandin. 
<b>Meşlûr :: Benî</b>	Sucuk :: Badem ve ceviz içi ile yapılan tatlı sucuk	Fermented sausage	Çandinî	Xwarineke ku ji cureyekî berhemên şîreya tirî tê çêkirin. Kakilê behiv an jî gûzê bi ta (benik) ve dîkin û di pilora şîreya tirî de dîkin.
<b>Mêşvanî :: Mêşkarî</b>	Arıcılık	Apiculture: (beekeeping)	Çandinî	Xwedîkirina mêşên hingiv.
<b>Meteorolojî :: Keşnasî</b>	Meteoroloji	Meteorology	Makîne	Zanisteka guherîna rewşên hewayê, cureyên iklimê vedikole û texmîna rewşa hewayê dike.
<b>Mêw</b>	Asma	Vine	Çandinî	Dara tirî.
<b>Mewij</b>	Kuru üzüm	Raisins	Çandinî	Tiriyê hişkîkirî.
<b>Meyldar</b>	Eğimli	Inclined	Makîne	Ciyên kaş, berjor an jî berjêr.
<b>Mezin</b>	Büyük	Big	Elektrîk	Di pîvanê de ya zêde. Bi çawanî, nîrx an jî bi dîmena xwe zêdetir.
<b>Mêzîna avê</b>	Su terazisi	Water gauge	Elektrîk	Amûra ku berwariya (asoyî) rûxarekî an jî xêzeka rast kifş dike. Lûleyek cam ku di navê de av û pelqên hewayê hene li ser depê (texteyê) ve zeliqandiye çêdibe. Wexta ku rûxar rast be pelqên hewayê di nivî de disekin.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Mezinbûn	Büyüme	Grow (to)	Çandînî	Firehiya, çawaniya ji berê zêdetir. Zêdebûna emr, pîr/ kal bûn.
Mifte :: Kilit	Anahtar	Key	Makîne	Amûra ku ji bo vekirin û girtina deriyan tê bikaranîn.
Mihîn	Dişi at	The female horse	Çandînî	Hespa mê.
Mij	Sis	Fog	Maden	Li ruyê erdê cureyekî ewr.
Mijar :: Babet	Konu	Subject	Elektrîk	Di nivîs, axaftin an jî di weşanê de fikra bingehîn. Bûyer, pirsqirêk an jî rewş. Tiştê li ser tê axaftin, xebat tê kirin.
Mijin :: Mêtin	Emmek	Suck	Elektrîk	1. Kîşandina madeyên şilek an jî gazê. 2. Bi alikariya ziman, lêv û gewriyê kîşandina heyberekî.
Mikap	Mikap :: Metreküp	Cubic meter	Elektrîk	Kûpê ku her keviyeke wî metreyek e, qewareya (hecm) wî dike mikapek. "Pênc mikap qûm."
Mikrofon	Mikrofon	Microphone	Elektrîk	Amûra ku bi bandora herikîna elektrîkê, deng digihîjîne denggirê.
Mikron	Mikron	Micron	Elektrîk	Ji milyonê yeka metreyê. Ji hezaran yeka milîmetreyê. Pîvaneke dirêjîya mikroskopîk e.
Mikroprosesor :: YÇN (Yekeya Çareserkirina Navendî)	Mikroişlemci	Cpu :: Central processing unit	Kompîter	Di kompîturê de parçeyê herî girîng. Mêjiyê kompîturê.
Mikroskopa ronakî	Işık mikroskobu	Light microscope	Elektrîk	Amûra bi alikariya çirûskên ronahiyê tiştên biçûk mezin dike.
Milê mîzîzî	Terazi kolu	Beam	Elektrîk	Aliyek (milek) ji amûra giranîpîvê.
Milyar	Milyar	Billion	Makîne	Hejmarake ku ji hezar car milyonî pêk tê. Navê hejmara 1.000.000.000 e.
Milyar elektron volt(yekeya enerjîyê)	Milyar elektron volt(enerji birimi)	Bev(billion electron volt)	Elektrîk	Yekeya enerjîyê. Milyar carê di bin barê potansiyela voltekê de hilgirtina enerjîya elektronekî. 1 mev=1, 602.10-10 j.
Minandin :: Simûlasyon	Simüle etmek	Simulate	Elektrîk	Ew bernamêyên ku ji bo çêkirin an jî ceribandina amûr, pêşnûma û makîneyan bi taybetî ji bi alikariya kompîturê tên çêkirin da ku amûr, pêşnûma yan jî makîne were fêmkirin. "Bûmelerza (erdhêj) çêkirî, bernamêya ji bo hînbûyîna bikaranîna makîneyekê"
Minare	Minare	Minaret	Avahîsazî	Barûyên zirav û dirêj ên ku li camîyan ji bo li serê bang tê dayîn.
Mirişk :: Tûtik	Tavuk	Chicken	Çandînî	Ajaleke kedî ye, di koxê de mezin dibe. Ji hêk û goştê wê sûd tê wergirtin.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Mirkut</b>	<b>Tokmak</b>	Mallet	Makîne	Wek çakûçêki mezin ê ji dar çêdibe. Darê savarê. Darê ku conî dikute.
<b>Misîn</b>	<b>İbrik</b>	Pitcher	Makîne	Amûreke ku ji bo avê tê bikaranîn. Ji bo çûn û hatina destavê bi kêr tê.
<b>Mişk</b>	<b>Fare</b>	Mouse	Elektrîk	Amûreke ji kompîturê ye. Amûra elektronik a ku li ser rûberekî rast bi alîkariya zivirandina gogeke qeydker dilivîne (dilîbitîne). Bi mişk mirov dikare di dosyayên kompîturê de nivîs, şêwe, wêne hwd. hilbijêre.
<b>Mitbex :: Aşxane :: Lênangeh</b>	<b>Mutfak</b>	Kitchen	Avahîsazî	Di avahiyan de cihê ku lê xwarin tê amadekirin, pehtin.
<b>Mizgeft</b>	<b>Cami</b>	Mosque	Elektrîk	Avahiya ku misilman tê de îbadetê dikin. Misilman jê re dibêjin mala Xwedê.
<b>Molekul :: Gerd</b>	<b>Molekül</b>	Molecule	Elektrîk	Madeya ku ji atomekê zêdetir atoman (gerdîle) pêk tê û taybetmendiyên elementan nişan dide.
<b>Mor</b>	<b>Mühür</b>	Seal	Makîne	Bi taybetî di nivîsên fermî de nişaneka taybet a erêkirinê ye.
<b>Morg</b>	<b>Morg</b>	Morgue	Avahîsazî	Li nexweşxaneyan an jî li goristanan cihê sar ên ji bo mirî lê ji bo demekê tên veşartin.
<b>Motel</b>	<b>Motel</b>	Road house :: motel	Avahîsazî	Otêlên biçûk ku li ser rêyan tên avakirin, ji bo ku mirov lê demekê bimine û pêdiviyên xwe pêk bîne.
<b>Motor</b>	<b>Motor</b>	Motor	Elektrîk	Mekanîzmaya ku her cureyên enerjîyê vediguherîne enerjîya mekanîk.
<b>Movik :: Cumge</b>	<b>Mafsal</b>	Joint	Makîne	Parçeyekî ku du beşan bi hev ve girêdide lê tevahiya tevgera wan asteng nake. Girêdaneke bi tevger.
<b>Mozik</b>	<b>Dana</b>	Calf	Çandinî	Golikên ku dev ji şîrvexwarinê berdane.
<b>Mûc :: Qelem</b>	<b>Keski</b>	chisel	Avahî	Ji bo rihostina dar, kevir, metal û hwd. amûreke hesinî ku seriyekî wê tûj û seriyê din jî ko ye, da ku bi çakûç were kutan.
<b>Mûçing</b>	<b>Cmbız</b>	Tweezers	Makîne	1. Amûreke ku dişibe maşîkê ye, ji bo girtin û kişandina heyberên zirav û biçûk tê bikaranîn. 2. Amûra ku mû pê tên kişandin.
<b>Muz</b>	<b>Muz</b>	Musa: banana: bananier	Çandinî	Fêkiyeke tropîk.
<b>Muze :: Kevnargeh</b>	<b>Müze</b>	Museum	Avahîsazî	Cihê ku lê pêşandana berhemên zanistî û dirokî tê kirin.

# N

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Nane</b>	Nane	Mentha: Menthe	Çandinî	Giyayekî aromatik.
<b>Nanê çûçê :: Nançivîk</b>	Kuş ekmeği	Polygdnum cognatum	Çandinî	Giyayekî mergê ye û li qeraxa çem şîn tê.
<b>Nasname</b>	Kimlik	İdentity	Makîne	Belgeya danasînê.
<b>Navbir</b>	Bölme duvar	Dividing wall	Avahî	Diwarê ku beşekê ji hev diqetîne.
<b>Navder</b>	Antre	Entree	Avahî	Di ketina hundir de beşa pêşîn.
<b>Navê bikarhêner</b>	Kullanıcı adı	Username	Elektrîk	Kesên ku makîne, kompîtur û bernemeyên kompîturê hwd. bi kar tîne.
<b>Navenda Elektrîkê :: Santral</b>	Elektrik santrali :: Şalt sahası	Power plants :: Switchyard	Elektrîk	Fabrîqeya ku di xwezayê de enerjîya cuda vediguherîne enerjîya elektrîkê. "Santrala elektrîkê, santrala nukleerê."
<b>Navendî :: Santral</b>	Özelsel :: Merkezi	Central	Elektrîk	Ê di navendê de. Ê ku navendê çêdikin. "Santrala telefonê."
<b>Naverok</b>	İçerik	Content	Elektrîk	Bi kurtasî mijarên ku di navê de.
<b>Navnişan</b>	Adres	Address	Elektrîk	Di daneyeke informatîk de di nav bîra (hiş) kakil de cî yan jî rêya gihiştina daneyê.
<b>Naylon</b>	Naylon	Nylon	Makîne	Madeya zexm û qayışokî.
<b>Nediyarî</b>	Belirsizlik :: Kesinsizlik	Uncertainty	Elektrîk	Rewşa nediyarbûnê.
<b>Nefel</b>	Yonca	Lucerin alfaalfa	Çandinî	Giyayek e, ji famîlyeya baqilan e.
<b>Nefela pê ya balindeyî</b>	Gazal boynuzu: lüfer otu	Lotus hakkariensis	Çandinî	Nefelege ku kulîkên wê zer in.
<b>Nefta xam</b>	Ham petrol	Crude oil	Maden	Nefta jîhevneqetandî. Li ser xebat nehatiye kirin. Nefta ji bin erdê çawa derketibe bi wî awayî.
<b>Negirêdayî</b>	Bağlantısız :: Hattan kopuk	Offline	Elektrîk	Qutbûna ku xeta komunikasyonê. Di komunikasyonê de qutbûna ragihînê
<b>Nehevyek :: Heterojen</b>	Heterojen	Heterogeneous	Kîmya	Têkela ku li hemû derên xwe ji aliyê rêjeyê ve xwedî taybetbendiyên cuda ye. Dijberî homojenê.
<b>Nelihevkiirî :: Hevnegir</b>	Uyumsuz	Discordant	Maden	Madeyên ku bi hev re nayên kelijandin. Madeyên taybetmendiyên wan li dijî hev in. Mînak; hesin û bafûn, av û rûn
<b>Neodinyûm</b>	Neodinyum	Neodymium	Makîne	Elementeke ku hejmara wê ya atomê 60 e.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Nepixî</b>	Şişkin	Puffy	Avahî	Tiştêkî ku ji qewara xwe zêdetir werimibe
<b>Neptun</b>	Neptûn	Neptune	Elektrîk	Gerstêrkek. Li gorî nêzbûna rojê gerstêrka rêza heştemîn.
<b>Nêr</b>	Eril	Male	Makîne	Mêr. Di hin zimanan de peyva ku ji zayenda mêr tê hesabandin.
<b>Nêrer :: Pêlweşên :: Dezgayê nardinê</b>	Verici	Transmitter	Elektrîk	Amûra ku bi alikariya pêlên elektromagnetik belavkirina deng, nişan an jî wêne dike.
<b>Nêrî</b>	Erkek keçî	Billy goat	Çandinî	Bizina nêr.
<b>Nerm</b>	Yumuşak	Soft	Makîne	1. Ne hişk, ter 2. Ne zivir "Bitirse ji germa germ û mirovê nerm." 3. Ne req, "Balguh nerm e lê kevir na."
<b>Nermalav :: Nivisbarî</b>	Yazılım	Software	Kompîter	Ji bo tevahiya pêdiviyên xebata kompîturê yê wêk program, belge, dokuman an jî tevan tê gotin.
<b>Nêrtarker</b>	Nötralize edici	Neutralizer	Elektrîk	1- A ku ji aliyê enerjîyê ve bar dike sifir. Madeya ku nakeve nava reaksiyona kîmyasal.
<b>Nexşe</b>	Harita	Map	Nexşe	Xêzkirina teşeyê rûyê erdê ya li ser kaxizekî.
<b>Nexşekarî :: Nexşedanerî</b>	Haritaçılık	Map compilation	Nexşe	Pîşekariya xêzkirina xerîteyan; nexşesazî.
<b>Nexşeya bikaranîna erdê</b>	Arazi kullanım haritası	Land use map	Nexşe	Nexşeya ku bikaranîna erdê nişan dide. Beşên erd bi çî armancê bîr bikaranîna di nexşeyê de tê nişandan. "bajarvanî, çandinî, qada şenahiye..."
<b>Nexşeya kadastryê</b>	Kadastro haritası	Cadastral map	Nexşe	Nexşeya ku sînorê erd û xwediyê erd nişan dide. Pîvanoka wan bi gelemperî 1/1000 û 1/5000 e.
<b>Neynok</b>	Tırnak	Nail :: Pawl	Makîne	1. Di mirov û gelek giyandaran de tebeqeya li serê tiliyan 2. Çiyên badayî yê amûrên wêk çengelê.
<b>Nêz :: Nêzik</b>	Yakın	Close :: Near	Makîne	1. Ne li dûr 2. Berdest.
<b>Nêzikatî :: Nêzikahî</b>	Yaklaşım	Approach	Makîne	1- Karê nêzîkbûnê 2. Şêweya nixandîna û nêrîna karekî.
<b>Nêzîkkirin</b>	Yakınlaştırmak	Zoom	Makîne	1. Anîna hindê 2. Kêmkirina mesafeyê.
<b>Nêzkirin</b>	Yaklaştırmak	Closer	Makîne	Anîna du tiştan a ber bi hev ve.



<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilîzî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Niftik :: Derbik :: Şiqat</b>	Kibrit	Match	Makîne	Amûra şewitandinê ya ji darikên biçûk.
<b>Nîgar :: Nexş</b>	Desen	Pattern	Avahîsazî	Ji bo dîtineke ciwankar hemû xêzên ku hatine çêkirin.
<b>Niha :: Êsta</b>	Şimdi	Now	Makîne	1. Ne berê ne jî paşê, ev dema ku tê de 2. Dema têdeyî
<b>Nikel</b>	Nikel	Nickel	Makîne	Elementeke ku hejmara wê ya atomê 28 e.
<b>Nîlüfer</b>	Nîlüfer bitkî	Nenuphar: waterlily	Çandinî	Riwekeke avî.
<b>Nimûne</b>	Örnek :: Malzeme örneği	Sample	Elektrîk	Mînak. Parçeyekî biçûk ê madeyê ku ji bo temami fikir dide. (Ji vî parçeyê biçûk di der heqê madeyê de pir tişt tê famkirin.)
<b>Nirxandina cewherê</b>	Cevher değerlendirmesi	Benefaction of ore	Erdnasî	Pîvandina asta nirxa cewheran. Xwerûkirin û dewlemendkirina cewheran.
<b>Nisk</b>	Mercimek	Lens: lentille combustible	Çandinî	Riwekeke ku çandiniya wê tê kirin ji malbata baqlan e.
<b>Nîşan bide</b>	Göster	Show	Elektrîk	Nîşandana tiştêkî yan jî kesekî.
<b>Nîşan bike</b>	İşaretle	Mark	Elektrîk	Fermana nîşankirinê
<b>Nîşandan</b>	Göstermek	Show	Makîne	1. Nimandin, ji kesekî re îşaretkirina tiştêkî 2. Pêşandan, rapêşandan *”ji tunebûna şêran, rovi xwe nîşan didin wek guran”
<b>Nîşander</b>	Gösterge	Indicator	Elektrîk	Amûra di derheqê xebata amerê (cîhaz) de bi ronahî yan jî di der heqê pîvanekê wê de agahiyê dide.
<b>Nîşaneya Erdhejê (Bûmelerzeyê)</b>	Deprem habercisi	Earthquake precursor	Erdnasî	Nîşanên ku di derbarê bûyîna erdhejê de agahiyê didin. Wek guherîna liv û tevgera av, hewa û qateka zemînê.
<b>Nîşanker</b>	İmleç	Cursor	Elektrîk	Di kompûturê de bi kontrolkirina mişk (mouse) an jî klavyeyê tê livandin, cîyê nivîsandin an jî cihê bê guhartin nîşan dide.
<b>Nîşe:: Not</b>	Not	Notice	Elektrîk	Nivîsa ku bi armanca bibîrxistinê tê nivîsandin.
<b>Nîştî</b>	Çökel	Sediment	Erdnasî	Nehelîyên bin avê yên ku di encama firidin û ji hev belavbûna zinaran de derdikevin holê.
<b>Nîştînasî</b>	Sedimentoloji	Sedimentology	Erdnasî	Beşa zanariyê ya ku di der barê neheliyên bin avê de lêkolînan dike.
<b>Niv :: Nîwe :: Nivçe</b>	Yarı	Half	Elektrîk	Parçeyek ji du parçeyên wekhev ku yekbûniyê pêk tînin. Ji duduyan yeka tiştêkî.

<b>Kurdî</b>	<b>Tirkî</b>	<b>Îngilizî</b>	<b>Beş</b>	<b>Pênase</b>
<b>Nivîsandin</b>	Yazma	Write	Elektrik	Kirina karê nivîsê. Xebitandina daneyan li ser hev an jî bi navber li dorhêla (nêvanga) daneyê yan jî li birekî (hişekî)
<b>Nivîsbariya azad :: Nermalava azad</b>	Özgür yazılım	Free software	Elektrik	Programên kompîturên ku ji bikaranîna her kesî re vekirî ne. Programên bêbedel, bêbuha.
<b>Nivîskar</b>	Yazar	Author	Elektrik	Kesên ku li ser zanist, huner, wêje hwd. pirtûkan dinivîse an jî amade dike. Bi taybetî kesên ku di rojname yan jî di kovaran de li ser mijarekê dinivîsin. Ji kesê/a ku nivîsbariya kompîturê nivîsandiye re jî tê gotin.
<b>Nivro</b>	Öğlen vakti	Noon	Makîne	Danekî ku tav di nîveka esmên de xuya dibe û siya heyberan bi qaşî cîsman dibe.
<b>Nizm</b>	Alçak	Low	Avahî	Bilindahiya kêma li gora referansekê. "Çiyayê Cûdî ji Çiyayê Agirî nizimtir e." Ji bo hemû zemînan tê gotin. "Xaniyê yekta ji xaniyê duta nizimtir e."
<b>Nobelyûm</b>	Nobelyum	Nobelium	Makîne	Elementa ku bi amerîkyûm û kuryûmê li labaratorê hatîye çêkirin.
<b>Nogin</b>	Düve(Genç ve doğurmamış inek)	Largest of the calf	Çandîni	Çêleka ku hîna nezaye.
<b>Nok</b>	Nohut	chickpea	Çandîni	Riwekeke ku çandîniya wê tê kirin, ji malbata baqilan e.
<b>Noqbûn :: Binavbûn</b>	Batma :: Battş (Geminin batması)	Stinging :: Sink (Sinking ship)	Fizik	Ketina binê avê.
<b>Noqkirin</b>	Daldırma	Immersion	Elektrik	Hedimandina (çêhlkirina) heyberekî di nava şilek an jî madeyeye nerm de. Ji bo muameleyê (kiriş) xistina parçeyekî ya nava şilekekî. Binavkirin.
<b>Nûbûn</b>	Yenileşmek	Become new	Makîne	Wergirtina şêweyekî nû, guncîna rewşeke nû, teze bûn.
<b>Nûjenkirin</b>	Güncelleme	Update	Elektrik	Tezekirina rewşê, wezîyetê. Rewşa tiştêkî anîna rewşa rojane, nûkirin. Guhertoya programan, nivîsbariyên herî dawîn.
<b>Nûketin</b>	Üye ol :: Kaydol	Sign up	Kompîter	Xwe lê zêdekirina endamên malperê. Yekem car endambûyîna malperê. Di malperê de ji bo ku kes bibin endam ew bişkoka ku tê tikandin.
<b>Nutron</b>	Nötron	Neutron	Elektrik	Hebikên atomê ku her yek giraniya wan nezi protonê û barê wan ê elektrîkê tune ye.

## O

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Oksijen	Oksijen	Oxygen	Maden	Elementa ku giyaneweran zindî dihêle. Bi şewata wê em enerjîyê serf dikin.
Onîks	Oniks	Onyx	Maden	Mermerê ku êdî qedemeya veguherîna wê nemaye.
Optîk :: Binayî	Optik	Optical	Makîne	1. Tiştê ku bi dîtîne re eleqedar e. 2. Beşa fizîkê ya ku li ser mijarên roniyê hûr dibe.
Organîzma :: Zîndewer	Organizma	Organism	Çandîni	Tevahiya lebatên ku giyandarekê/î pêk tînin, uzwiyet.
Orkîde	Orkide	Orchid	Çandîni	Riwekeke xwezayî ye, ji toven wê salep tê çêkirin.
Osîlatora bêaheng	Uyumsuz salıncı	Anharmonic oscillator	Elektrîk	Amûra ku bê aheng û bi dor herîkîna alternatîf çêdike.
Oto	Oto	Auto	Makîne	1. Otomobîl 2. Amûrên ku bi rêyên mekanîk tîn tevgerandî û xwe bi xwe bi rê ve dibin.
Otomasyon :: Xodkarî	Otomasyon	Automation	Elektrîk	Karê ku bêyî alîkariya mirov, bi alîkariya makîneyan xwe bi xwe tê kirin.
Otomatîk :: Xodkar	Otomatik	Automatic	Elektrîk	Amûra ku bi rêyên mekanîk dilive, xwe bi xwe (xweserî) bi rê ve dibe.
Ozon	Ozon	Ozone	Makîne	Elementa ji oksîjenê ya ku di molekulê wê de 3 atom cî digirin


## P

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Pace :: Şîbak :: Pencere	Pencere	Window	Maden	Beşa vekirî ya di avahî yan jî makîneyan de ji bo ronahî û danûstendina hewayê.
Paket :: Pêçek	Paket	Packet	Elektrîk	Objeya di navê de tiştê an tiştin bi destan bîhîlgirtin; bi kaxez hatiye dorpêçkirin, an jî di nava qutiyê de hatiye girêdan.
Paladyûm	Paladyum	Palladium	Makîne	Elementek e ku hejmara wê ya atomê 46 e. Dişibe platînê.
Palan :: kurtan	Semer	Saddle	Çandîni	Clên heywanên bargir.
Paldank :: Pişte	Dayanak	Support	Makîne	1. Kursî, sendelî 2. Pişte, palpişt, balif 3. Sparte, destek.



Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Pale :: Êlxat:: Wertzvan :: Sepan :: Karker :: Karkerên çandiniyê</b>	Irgat	Laborer	Çandînî	Xebatkarên çandiniyê.
<b>Palet</b>	Palet	Caterpillar	Maden	Di maşîneyan de, ji bo qada herî û bi berf an nêzikî wan tê xebitandin.
<b>Pankirin :: Rastkirin</b>	Düzleştirme	Flatten	Makîne	1. Tekûzkirin, rastkirina ruyê tiştêkî 2. Sererastkirin.
<b>Pano</b>	Pano	Panel	Maden	Paceya ku amûrên kontrolê tê de tên bicîkirin. Ji bo kontrolkirina pergala elektrîkî yan ji kontrolkirina makîneyan tê bikaranîn.
<b>Paqijker</b>	Temizleyici	Cleaner	Elektrîk	1- Programa ku bîra (hiş) kompîturê vala dike. 2- Kes an jî objeya ku paqijiyê dike.
<b>Paqijkirin</b>	Temizleme	Cleaning	Kompîter	Valakirina, sifirkirina daneyê di nav bîra (hiş) kompîtur an jî makîneyê de didome.
<b>Par</b>	Geçen yıl	Last year	Fizîk	Sala ku derbas bû, qediya. Sala çûyî.
<b>Parabol :: Birgeya hevta</b>	Parabol	Parabola	Elektrîk	Grafîkeke ji şeweyê geometriyê ye. Şeweyê wî dirûvê nivê kubîkê dide.
<b>Paraboloit</b>	Paraboloit	Paraboloid	Elektrîk	"Paraboloita elîptîk, paraboloita hîperbolîk."
<b>Paradoks :: Hevdijî :: Dijgeyî</b>	Paradoks	Paradox	Makîne	1. Fikir an jî rewşên lihevnehatî. 2. Fikreke nelirê, çeprast 3. Dijraber.
<b>Parametre</b>	Parametre	Parameter	Elektrîk	Guhêrbare ku bandor û têkiliya li ser tiştêkî nîşan dide.
<b>Parastin</b>	Koruma	Protection	Elektrîk	Di elektrîkê de li hemberî arîze û di karê elektrîkê de li hemberî kirina şaşiyên xebatkarên, ji bo ziyane kêma bigirin, parastina jiyana mirov, candar û parastina xerabûna amûran. "Parastina van amûrên (cîhaz) nû tev di nav xwe de çêkirine."
<b>Parastin</b>	Savunmak	Defend	Makîne	1. Berevanîkirin, ji xetere û bandorên neyînî dûrhiştina tiştêkî yan jî kesekî. 2. Hemet kirin "Gund, bê se nayê parastin."
<b>Parastina lêjî</b>	Şev korunması	Slope protection	Erdnasî	Zeximkirina lêjîyê. Pêşlêgirtina ramalîne. Minak; Di bendavê de ruyê aliyê avê bi kevîrên gewre tê zeximandin. Diwarên li kêleka rê ku ji bo pêşlêgirtina hilweşîna axê tên çêkirin.
<b>Parçe :: Pêkhate</b>	Parça	Component	Elektrîk	Tiştê ji yekbûniyê qetiyayî, bi tenê tê jimartin an jî ji yekbûniyê zêde maye. Her yek ji tiştê hêsan ku yekbûniyê ava dikin. "Hejmara parçeyên vê komê çend in?" "Di nava cilên min de çend parçeyên xweşik hene."


Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
Parçebûn	Parçalanma	Fragmentation	Maden	Hûrbûn û ji hev veqetîna madeyan.
Pardar	Hissedar	Shareholder	Maden	Kesê/a ku xwedî par e.
Parêz :: Bostan	Bostan tarlasî	Melons field	Çandinî	Baxê hêşînahiyê.
Pasîf	Edilgin :: Pasif	Passive	Elektrîk	1. Di elektronîkê de parçeyê ku ne aktîf e, karê aktîf nake. 2. Ji bo kesên şermende, sekandî.
Paş	Geri	Rear :: Back	Makîne	1. Pişt 2. Dawî.
Paş	Geri :: Önceki	Back	Kompîter	Xebitandina di programên kompîturê de xebata beriya niha. Dijberî "pêş". "Ew agahiyên ku em lê digerin di malpêrê de di rûpela paş de bûn."
Paşdahiştî :: Derenghiştî :: Vehiştî	Geciktirilmiş göçertme yöntemi	Retarded	Maden	Rêbaza ku ji bo derxistina cewherê pêşgirtina herivandina axê.
Paşerokên radyoaktîf :: Avêtîyên radyoaktîf	Nükleer atık	Radioactivewaste	Maden	Ji bermahiyên ku piştî karê nukleerî dimînin.
Paşketin	Gerileme	Recessional	Makîne	1. Karê paşveçûyîné 2. Lawaz bûn, kêmbûn.
Paşlerze	Artçı sarsıntı	Aftershock	Erdnasî	Hejîmên zeminê yê bê pergal ku li dû erdheja mezin pêk tîn.
Patent	Buluş belgesi	Patent	Elektrîk	Belgeya (dokumana) kifşê. Belgeya vedîtina tiştêkî nû. Belgeya di bin parastina qanûnê de ji bo kifşa proses, amûr an jî metodeke nû, ji aliyê ofîsa patentê ve tê dayîn.
Pêçan :: Lefandin :: Dorzivrin	Sarmak	Wrap	Makîne	1. Paçkîrin 2. Lêalandin 3. Dorlêgirtin.
Pehnî	Topuk	Heel :: Toe	Makîne	1. Paşya pêlavê 2. Dawiya solê.
Pêjgir	Havlu	Towel	Makîne	Paçe ziwakirinê.
Pêkhata şepalûya girtî	Sıkıdolmuş altıgensel yapı	Close packed hexagonal structure	Fizîk	Şeşgoşeya rast ku xwedî bilindahî ye û 3 rehend e. Ser û binê wê şeşgoşe ye, dora wê jî bi çargoşeyan pêçayî ye.
Pêkhateya kevirî :: Pêkhateya berdî	Kayaç yapısı	Rock structure	Erdnasî	Cure û taybetmendiyên kevir an jî keviryan.
Pekîn	Sekme	Rebound	Fizîk	Bi sedema lêketina heyberekî bertek çêdibe û ew heyber vedigere.
Pêl	Dalga	Wave	Elektrîk	Di fizîkê de lerza ku belav dibe û bi xwe re enerjîyê radigihîne.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Pêlav :: Sol</b>	<b>Pabuç :: Ayakkabı</b>	Shoe	Makîne	Amûra lixwekirin û parastina lîngan ku bi piranî li derveyî malê tê bikaranîn.
<b>Pêlbir :: Pêlşikên</b>	<b>Dalgakiran</b>	Jetty	Nexşe	Diwarê di nava deryayê de nêzî peravê ye, ji bo kêmkirina bandora (hêz) pêlên avê. 
<b>Pelçîmhewêz :: Pelhewêz</b>	<b>Sinir otu</b>	Plantago sp	Çandînî	Giyayek e di hekimîyê de tê bikaranîn.
<b>Pelçiqandin :: Pelixandin</b>	<b>Ezmek</b>	Crush	Elektrîk	Bi alikariya hêzekê tişt şeweyê xwe diguherînin. Dema mirov pê li fêkiyekê bike fêki şeweyê xwe diguherîne, diqelîşe û ava nava xwe derdixe, ev pelçikandin e.
<b>Pelê mêwê</b>	<b>Asma yaprağı</b>	Grape leaves	Çandînî	Pelên dara tirî.
<b>Pelê silkê</b>	<b>Pazı yaprağı</b>	leaf beet	Çandînî	Pelên giyayê silkê ku ji familyeya ispanaxê ye.
<b>Pêlên erdhejê</b>	<b>Deprem dalgaları</b>	Earthquake waves	Erdnasî	Di dema erdhejê de ji navenda erdhejê ber bi derve ve hêza heja zemînê.
<b>Pêlên hertzî</b>	<b><math>3 \times 10^{10} - 1</math> :: <math>5 \times 10^5</math> hz aralığındaki dalgalar</b>	Hertzian waves	Elektrîk	Pêlên hertz bi navê zanyarê Alman Heinrich Hertz hatiye binavkirin. Pêlên hem elektrîk, hem manyetîk in ango elektromanyetîk in û bi leza ronahiyê li hewayê belav dibin. Frekansên wan di navbera $3 \times 10^{10} - 1, 5 \times 10^5$ hz (dirêjîya pêlan di navbera 2 cm – 2.000 m) de ye.
<b>Pelîn</b>	<b>Yapraksı</b>	Foliated	Avahîsazî	Tiştê ku wek pel xuya dike.
<b>Pêlweş</b>	<b>Dalga yayıcı</b>	The radiator	Elektrîk	1-Amûra ku hewa, av an ji hilma germkirî yan jî sarkirî belav dike û bi vî awayî germahî yan jî hênakahiyê çêdike. 2-Sarkera ku zêdebûna pîleya germa motora ku bi xwe ve girêdayî ye dixîne.
<b>Pembû</b>	<b>Pamuk</b>	Cotton	Makîne	Riwekeke ku berên wê spî ne, dişibin hiriyê, nerm e. Di tekstîlê de yek ji madeyên xam e, pê cil çêdibin.
<b>Pênûs :: Qelem</b>	<b>Kalem</b>	Pen :: Pencil	Makîne	Amûra nivîsînê.
<b>Pêpelûk :: Pêlik :: Pêngav</b>	<b>Basamak</b>	Step	Avahî	Ji bo derketina çiyekî bilind çihê ku mirov piyên xwe datînin, her yek ji wan bi bilîndiya 17 cm'yan tê çêkirin.
<b>Per :: Bask :: Çeng</b>	<b>Kanat</b>	Wing	Makîne	1. Lebatê firîndeyan ê ku pê perwaz digirin; per 2. Çepil, mil *'' Her teyr bi baskên xwe difire."
<b>Pêrar</b>	<b>İki yıl yıl önce :: Evelki yıl</b>	Two years ago	Fizîk	Du sal berê.
<b>Perde</b>	<b>Ekran</b>	Screen	Kompîter	Amûra rûxara wê rast û ne zebloq ku bi alikariya (rêya) ronahiyê wêne yan jî videoyan nişan dide.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Pere :: Dirav</b>	Para	Money	Makîne	Amûra dayînê ku ji kaxiz an jî ji metal hatiye çêkirin.
<b>Pergal :: Sistem</b>	Sistem	System	Elektrîk	Tevahiya rêbazên ku bi kêra bidestxistina encamê tên.
<b>Pergala metreyî :: Sistema metrî</b>	Metrik sistem	Metric system	Elektrîk	Di matematîkê de pîvanekên pergala metreyê.
<b>Perperok :: Îdidok :: Pinpinîk</b>	Kelebek	Butterfly	Çandî	Kêzike ku temenê wê gelekî kin e.
<b>Perwane</b>	Pervane	Propeller	Maden	Pirî caran seba sarkirin û tevgerdayînê tê xebitandin.
<b>Perwerde</b>	Eğitim	Education	Makîne	Karê hinkirin û fêrkirinê.
<b>Pestandin</b>	Sıkışma	Compression	Maden	Tiştê ku di nava du tiştan de asê maye.
<b>Pestîn :: Pestîner</b>	Pres :: Baskı	Press	Makîne	1. Şîdandina heyberekê di nava du hêz an jî metalan de. 2. Makîneya ku karê presê dike.
<b>Pêş</b>	İleri	Forward	Kompîter	Di programên kompîturê de xebata piştî niha. Dijberî "paş": "Ew agahiyên ku em lê digerin di malpêrê de di rûpela pêş de ne."
<b>Peşk</b>	Sıçrama :: Saçntı (Sıvılar için)	Splash	Fizik	Bi sedemeke (kevir li avê dikeve, ava ku dirije û bi erdê dibe... ) belavbûna dilopên şilekîyan.
<b>Pêşkêşker :: Servir</b>	Sunucu	Server	Elektrîk	Kompîtura bingehîn a ku di networkê de ji aliyê bikarhênerên din ve karin bigihîjin dane û çavkaniyên wê.
<b>Pêşveçûna rojane</b>	Günlük ilerleme	Daily advance	Maden	Di rojekê de karê ku hatiye kirin.
<b>Petkîrin :: Puxtekîrin :: Paqijkirina xamî :: Zengînkirina cewher</b>	Atık (cevher zenginleştirme)	Refuse (ore dressing)	Erdnasî	Bi rêbazên curbicur paqkîrin bi nixkîrin û zelalkirina (safkîrin) cewherekê.
<b>Pêvajo :: Proses</b>	Süreç	Process	Elektrîk	Di kompîturê de kirariyên ku berdewam dikin. Ji bo gihîştina encamêkê rêzên pêpelokên kirariyan.
<b>Pêvek</b>	Ek	Additional	Fizik	Ji bo kêmasiyên tiştan bîrî tamamkîrin parçeyên ku pê ve tînin. Zêdekîrin, mezinkîrin.
<b>Pêveke :: Pê ve bike</b>	Yapıştır	Paste	Kompîter	Daneyê ku di hişê (bîr) amûra elektronîk de ye di amûrê de ji çiyekî bê qopikîrin, bi çihêkî din ve kirina daneyê.
<b>Pêxistin :: Vêxistin</b>	Yakmak	Burn	Makîne	Agirdadan/hilkîrin.
<b>Peya :: Piyade</b>	Yaya	Pedestrian	Makîne	Kesê ku bi meşê diçe.
<b>Peyam</b>	Mesaj	Massage	Makîne	1. Agahî, xeber, salix 2. Pêxem.

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Beş	Pênase
<b>Peyam</b>	Mesaj	Oblique	Elektrîk	Armanckirina têgihandina hest an jî fikrê (ramanê), xwe bi nivîs an jî bi gotinê nişandana. "Ez dixwazim jê re bi telefonê peyamekê bişînim."
<b>Peyama elektronîk</b> :: Posta Elektronîk :: E-posta :: E-name	Elektronik posta	Electronic mail	Elektrîk	Şandina peyama, agahî yan jî, daneyan bi rêya telefon, kompîtur an jî internetê. "Piştî çend salan bi rêya peyameke elektronîk em li hev hatin."
<b>Peyatî</b>	Yaya	Pedestrian	Avahî	Rêçûna bi piyan.
<b>Peyman</b>	Sözleşme	Contract	Elektrîk	Belgeya di navbera dudu yan jî zedetir kesên ku her du aliyan girêdide, ji bo kirin an jî nekirina tiştekî li ser lihevkirina tiştekî.
